# SÎSÊ

## (Ez Dixwazim Weke Şehîd Bêrîtan Bibim Gerîlla)

**Husên Secîye**

**AKADEMIYA ZANISTÊN CIVAKÎ YA ABDULLAH OCALAN**
**WEŞANÊN WÊJEYÊ**

**Cihê Çapkirinê: Çapxaneya Azadî**

**Dîroka Çapkirinê: 2011**

“Çiyayê bilind warê me ye

Ar û namûs barê me ye

Li hemberî van zordestan

Li hemberî van xwînmijan”

Hevalekî ev stran distirî… Hevalê din berê xwe da hevalê xwe û jê pirsî:

-Heval ji bo çi tenê çiyayên bilind warê me ye? Ma qey em hemû bajaran, deştan, geliyan, zozanan ji zordest û xwînmijan re bihêlin? Ez jî niha diçim bajêr, peywira min li bajêr e. êdî ar û namûs na barê min e?

-Gotinên te di cih de ne, heval. Çiya, deşt, zozan, bajar her derên Kurdistanê warê me ye; her tim jî ar û namûs barê me ye. Ji bo ku ew stran di bîra min de mabû, min jî ew got.

Du heval bûn. Rêka wan hewraz û berwar bû. Tenê darên kevotê bişkivîbûn. Ji ber ku zivistana derbasbûyî berf û biharê jî baran gelek barîbû, şiverê jî tê de, hemû rê û rêçik wenda bibûn. Ji ber vê yekê çolebir meşiyan. Di rê de hevalekî bi dengekî nizm strana:

“Serê çiyan bi dûman e

Birîn kûr e, bê derman e”

Bavê min distirî…

Piştî nîv saet-çil û pênç xulekan li serê girekî ji bo bêhnvedanê sekinîn. Gir bi şikêr bû; rûniştin û telefona xwe vekirin. Di heman demê de zenga telefonê lê da. Yê telefon dikir, hevalê ku li bendî wan bû. Digot:

-Piştî du saetan em ê di navbera du qerekolan de li bendî we bin, heya wê wextê li wê derê amade bin.

Her du heval ji serê gir, ji nav şikêran rabûn. Bi bêhna fireh ber bi cihê ku dê hevalek û dû dost li bendî wan bisekinin meşiyan. Berî wan gihîştin cihê xwe. Heya yên ku wan pêşwazî bikin hatibana, li paş kevirekî xwe veşartin. Telefon jixwe vekirî bû. Zenga telefonê dema lê da, ên ku wan pêşwazî bikin bi telefonê gotin:

-Heval em li bendî we amede ne.

-Em jî amade ne…

Her du heval rabûn ser piyan. Di hewrazekî pir asê, hewrazekî ku pezkûvî jî nikarin tê re bi hewa kevin, hevalek bi hewa ket. Hevalê din jî li jêr, li ser riya şose sekinî. Nûnerê PKK'ê di serê rêzê de, her du dostan jî destê heval guvaştin. Berî ku li hal û wextê hevdu bipirsin, ji dostan ê zikmeşk keniya û berê xwe da hevalekî

-Ma mirov bi vî rengî tê karên dîplomasiyê? Mirov qet bi kincên gerîlla tê bajaran? Ji bo çi tu bi kincên sivîl nehatî?

-Ji bo ku ez bi lez û bez bi rê ketim, bajar jî dûrî cihê me bû, kincên sivîl bi dest min neketin; ji ber vê ez bi kincên gerîlla bi rê ketim.

Piştî vê axaftinê berpirsyarê berê yê PKK'ê, dost û berpirsyarê nû yê PKK'ê bi hevdu dan nasandin:

-Ev hevalê me, berpirsyarê me yê nû ye; ev her du dost jî, Hecî... û Hecî... Gotina xwe qedand û keniya…

-Heval ji bo çi tu ewqasî bi dengekî bilind keniya?

-Heval, êdî li vî welatî pêwîst nake tu navê kesî bîne ziman. Her kesek li vî welatî Hecî ye. Çûbe Hecê yan neçûbe Hecê jî, her kesek Hecî ye…

-Baş e, fanîlayê xwe bi ser yelekê xwe yê leşkerî de berde; em ê di rê de pêlavekê peyda bikin û pêlava te ya mekap jî biavêjin.

-Baş e…

Piştî vê diyalogê, şofêr wesaîta megzemîn-toyota da xebitandin û bi rê ketin. Lê bala nûnerê nû yê PKK'ê, her li ser her du dostan bû. Ji dostên ku ew pêşwazî kirin yek xwîngerm û zikmeşk bû. Yê ku destpêkê bixêrhatina heval kirî, yekî xwîngerm bû. Lê yê dîtir; yê qaşo dostê me; yekî xwînsar bû. Ango wek marekî sar bû. Qet, bixêrhatina heval jî nekir. Di dest wî de mekîneke wêneyan, wêneyên xwezayê dikişand. Her dîmenên xwezayê yên balkêş, xweşik û yên ku hunermend nikarin wan teswîr-şanase bikin dikişandin.

Rêka wan şose bû. Wesaît di nizar re derbas dibû. Ji ber aşûtê berf bibû weke betonê. Mirov ji ber vê yekê, wexta ku di pencereyên wesaîtê de li dervê dinihêrî pir ditirsiya, ziravê mirov diqetiya.

Di rê de yên ku di wesaîtê de bûn, hema hema qet bi hevdu re neaxifîn. Ji bo kirîna hin kuvarikan şofêr wesaît sekinand. Her çar ji wesaîtê peya bûn. Şofêr jî xwest ku ji wesaîtê peya bibe. Ji dostên wan ê zikmeşk ê ku kêmekî xwîngerm û dev li ken, bi zimanê Azerî li şofêr heytan:

-Sen maşînde dûr, aşaxı înme.

-Temam, înmem.

Sê kîlo kuvarik ji gundiyan kirîn û li maşînê siwar bûn. Heya cihê ku xwarina xwe lê bixwin şofêr wesaît bi şêwazekî asayî ajot. Êdî di rê de berf nema bû, rêk reşayî bû. Li ber xwaringehekê, şofêr wesaît sekinand. Her pênc ji wesaîtê peya bûn. Beriya

ku têkevin xwaringehê her sêyan ji hev re gotin; em destnimêja xwe bigirin, piştre taştê bixwin. Ji ber van gotinan berpirsyarê berê yê PKK'ê bêzar bû. Berê xwe da berpirsyarê nû:

-Ev, ewqas pir nimêj dikin ku mirov tu caran di wextê xwe de nagihîje ser karê xwe.

Piştî nimêjê bi hev re taştê xwarin. Taştêya wan dewlemend bû; hêkên kelandî, rûnê nîvişk, zeytûnên şîn, ango zeytûnên salamûra, çay…

Dostê zikmeşk û piçekî xwîngerm, berê xwe da berpirsyarê nû yê PKK'ê:

-Heval, ez ê biçim ji bo te kincên sivîl bînim. Hûn hemû li vir li bendî min bisekinin, heya ku ez bizivirim.

-Baş e Hecî.

Dost bi lez çû û zivirî. Yelekek, pantolonek û pêlavek qundura ji heval re anî. Kincên ku anîn radestî berpirsyarê nû yê PKK'ê kir. Jê re got:

-Heval biçe paş xwaringehê, li wê derê mezelek heye. Kincên xwe yên gerîlla ji ber xwe bike, yên medenî li xwe bike. Ji bo rêzgirtina me jî tu wisa bike baştir e.

-Min ligel Filistîniyan perwerdeya leşkerî dîtîbû. Wê wextê wan behsa girtina kadroyekî xwe dikirin.

-Çawa hatiye girtin, li ku derê hatiye girtin?

-Wexta ku me ligel Filistîniyan perwerde didît, ji bo ku em dersan ji kêmasiyên kadroyê wan derxin, serpêhatiyên xwe ji me re vedigotin. Yek ji rêxistinên Filistîniyan, ji bo wezîfeyek dûr û dirêj a li derveyî Filistînê, kadroyekî xwe perwerde dike. Êdî digihîjin biryarê ku ew kadro dikare wê wezîfeyê baş pêk bîne û bi balafirê wî dişînin welatekî Ewrûpayê. Lê, wexta ku balafir li qada balafirê tê xwarê, ew milîtanê Filistînî diçe destşoyê. Ji dest-

şoyê der tê, lê fermûara pantolonê xwe nagire. Tê di nîvê balafirê de fermûara xwe digire. Lewma, polîsên wî welatê Ewrûpayê yekser milîtanê Filistînî digirin.

-Rast e heval. Mirovên Rojhilata Navîn hin tiştan pêş çavan nagirin; lewma, em ji hin tiştên biçûk her wenda dikin.

-Bi gotina te yê Hecî. Nêzî sih salî ye danûstandina me û we heye. Eger dostaniya me ya bi salan nebûya, hin hêzên dewletên din an jî hin hêzên rêxistinan li şûna we bûna, dê ez girtibama.

-Tu caran em, wê yekê nakin. Bi salan e me li hemberî endamên PKK'ê pêkanînên wisa nekirine. Û em li dijî berpirsyarên PKK'ê yên fermî vê yekê qet nakin.

Ji xwaringehê heya ber deriyê mala komunê ya PKK'ê, di wesaîtê de qet kes bi hev re neaxifî. Wexta ku ji wesaîtê peya bûn, şofêr jî tê de, her çaran bi kêfxweşî destên hev guvaştin.

Lê, ew ê qaşo dostê PKK'ê ye, yê ser rût û xwînsar, di hemû rêwitiyê de bi liv û tevgerên xwe wek bûmekî bû.

Dost û şofêr derbasî hundirê mala komunê nebûn. Dostê zikmeşk û xwîngerm piştî xatirê xwe xwest:

-Em ê piştî du rojan hev bibînin, Heciyê mezin jî dê were hevdîtina heval…

-Ser çavan, em ê piştî du rojan hevdu bibînin…

Di mala komunê ya PKK'ê de hevalek tenê hebû. Rabû ser piyan, hevalê nû yê berpirsyarê PKK'ê bi hemû hêza xwe hembêz kir. Berpirsiyarê berê jî bi serê xwe ji hevalê ku di mal de bû re got:

-Ji te re jî silav.

Piştre, hevalê li malê ji hevalê berpirsiyarê nû re got:

-Sibe û du sibe çend malên dostên me hene, ez ê wan bi te bi-

dim nasîn. Çi dibe çi nabe, ji bo ku tu li vir tengav nebî, pêwîst e, tu wan dostan nas bikî...

-Wexta ku, li Herêmên Parastinê yên Medya, hevalan ez wezîfedar kirim, ji min re gotin, dibe ku li ser sînor hevalê berê yê berpirsyar rê bikin. Ji ber wê, ji min re gotibûn, agahiyên pêwîst ji heval bigir ku tu zehmetiyan nekişinî û perîşan nebî.

Heval, beriya ku şîve bixwin, çû destşoyê xwe şuşt.

Piştî şîve jî qet bi hevdu rê neaxifîn, demek kin li televîzyonê temaşe kirin. Ji ber zor westiyayî bûn, her du heval li ser kursiyan xilmaş dibûn. Ji ber vê yekê, hevalê li malê ew her du şiyar kirin, gote wan:

-Ji bo we min nivîn danîne, rabin di nav nivînan de binivin.

Her du heval rabûn ser piyan û bi gotina hevalê xwe kirin. Bi çavên xilmaş çûn mezelê ku tê de binivin. Hevalê dîtir heya derengiya şevê, televîzyon temaşe kir. Ew jî di mezelê ku televîzyon tê de bû serpas, ango ser vekîrî, bê lihêf nivist.

Berpirsyarê nû yê PKK'ê ji berpirsyarê berê bi çavên xilmaş pirsî:

-Heval ew ê ku li sînor ligel te hatibû, yekî ser rût hebû. Ew mirovekî gelekî xwînsar bû, wek marê sar bû. Ew zilam ma dijminê me ye?

-Belê, heval; ew ji dijminan jî xerabtir dijminekî me ye!

-Ji bo çi dijminahiya me dike? Hevalê wî qet ne wisa bû, dev li ken bû.

-Ew ê ku tu behs dikî, yê ku wek bûmekî heya vir li kêleka te rûniştibû; ew zilam li dîjî tevgera me ya azadiyê tiştên xerab dike. Zilamêkî wî jî, xwestibû destdirejiyê jina dostekî me bike. Hevalên me jî ew zilamê wî bi mirinê ceza kirin. Ji ber wê, ew zilam wexta ku endamekî PKK'ê, dostekî PKK'ê dibîne, wisa lê tê. Hema

dixwaze heyfa xwe werbigire. Piştî taştê, berpirsyarê nû yê PKK'ê û hevalê ku li mala komunê de, bi hevdu re derketin derve. Ji bo dîtina dostan û naskirina bajêr du rojan û du şevan heya nîvê şevê her du heval li malên dostan û bajêr geriyan.

Piştî du rojan, sibê zû zenga telefona berîkê lê da. Berpirsiyarê berê yê PKK'ê rahişt telefonê:

-Silav û hurmet Hecî; tu çawa yî, baş î?

-Silav û hurmet heval. Ez ê bêhneke din bêm, hevalê ku nû hatî bibim, ji bo ku bi Heciyê mezin re biaxife. Hûn her du heval jî xwe amade bikin, ji ber êdî hûn ê ji welatê me biçin.

-Hecî, heval dê çawa bi tena serê xwe bimîne? Tu deran, tu kesî jî nas nake. Pêwîst e, yek ji me ligel heval bimîne. Pêwîst bû ez biçûma, lê hevalê dîtir ligel heval bimana. Em wek PKK'ê vê helwesta we tu caran qebûl nakin!..

-Di civîna dawiyê de ku bi hevalê ve re pêk hatîbû, me ev qerar wergirtibû heval. Lewma hûn her du heval jî dê biçin. Wê tenê berpirsyarê we yê nû li vir bimîne.

Heval bê dilî xwe û tund got:

-Baş e Hecî!

Sibê zû heciyê zikmeşk bi telefonê got; piştî saetekê ez li gel we me. Her du hevalê ku berê li vir diman, wê biçin. Bi hevalê nû yê berpirsiyar re jî Heciyê me yê mezin dê were hevdîtinê bike.

Her du hevalên ku biçin ji berê de amadekariyên xwe kiribûn. Ji bo ku bi xwirînî bi rê nekevin, bi lez xwirîniya xwe şkandin, taştê xwarin. Di wexta ku Heciyê zikmeşk gotibû; "divê hûn amade bibin," zenga deriyê malê lê da. Berpirsyarê berê yê PKK'ê derî vekir:

-Kerem bike, Hecî.

-Spas. Hûne biçin, li ser rêka qîr wesaît amade ye.

Her du hevalan, bi mirûzekî tirş, gotin: “Baş e Hecî!”

Hevalê xwe yê ku li vê derê wê tenê bimîne jî, bi hemû hêza xwe hembêz kirin:

-Serkeftin heval, li xwe baş binihêre.

-Ji bo we jî serkeftin hevalno! Hûn jî li xwe baş binihêrin.

Heciyê zikmeşk, berpirsyarê PKK’ê heya cihê ku hevdîtin pêk were bi taksiyê bir. Di xaniyê çûnê de kes tune bû. Televîzyoneke herêmî, makîneyeke faksê û sobeyek a gaza xwezayî tê de hebû. Heval jixwe mezelên dîtir jî nedîtibû.

Heciyê ku dê bi heval re hevdîtin pêk anîba pir, dereng ma. Ji ber vê yekê, heval pir bêzar bû. Serê her kêliyekê, ji Heciyê zikmeşk pirs dikir:

-Hecî, Hecî dê kengî were?

-Karê wî derketiye, ji ber vê yekê dereng maye. Bibexşîne…

-Karên min jî hene Hecî; hem jî gelek kar û barên min ên pewîst hene.

-Ez çi bikim heval? Tiştek ji destê min nayê. Ew çi dibêjin, ez li gorî wan tevdigerim. Ew ji min payebilindtir e. Ez nevêrim careke din jê pirs bikim û bêjim, Hecî tu çima dereng ma.

Heval jî bê dil û bi hêrs got:

-Baş e Hecî!

Berî nîvro, Heciyê mezin û ligel wî jî yekî din, ji bo hevdîtinê hatin. Bi silavê ketin mezel, bi destê hev girtin. Yê ku pêşî ket mezel; yê dirêj û serê wî heya nîvî rût, gote heval:

-Tu bi xêr hatî, tu çawa yî? Ji bo ku ez dereng mam, li min biborîne.

-Xem nake Hecî, spas tu çawa yî?

-Teşekur dikim, heval.

-Hevalên ku ez nas dikim çawa ne?

-Hemûyan silavên xwe ji bo we şandin.

-Ser seran, ser çavan…

Piştî vê axaftinê demeke kin bêdengiyek ket mezel, kes bi kesî re neaxifî. Piştre Heciyê mezin ê Faris, berê xwe da Heciyê Azerî, yê ku ligel hevdu hatibûn. Bi Farisî got:

-Tu wî nas dikî?

-Na, ez nas nakim. Ez navê wî qet guh lê nebûme. Nêzî sih salî ye ez bi PKK'ê re danûstandinê dikim; lê, ez wî nas nakim.

Paşê jî berê xwe da heval, Heciyê Fars:

-Ma, hevalên te çima wisa dikin? Ma ne sih sal danûstandina me heye! Em bi hevdu re çê, xerab dostaniyê dimeşinîn. Di têkiliyên me yen ewqas sal de, ger di navbera me de gelek pirsgirekên ku hîna divê bêne çareserkirin hebin jî, em jî hûn jî, pêwîst e li hemberî hev bi rêz tevbigerin.

-Ez baş tênegihîştim Hecî? Lê, ne PKK û ne endamên PKK'ê, tu caran li hemberî dostên xwe bêrêziyê nakin.

-Binêre heval, her tim berî ku heval an jî hevalên we werin gel me destpêkê sicîlê wan ji me re dişînin. Lê, vê carê tenê navê te şandine. Ji bo çi?

-Hecî, ez bi lez hatim. Nameya ku hevalan ji bo we şand jî bi lez nivîsandin. Dibe ku ji ber vê hevalan sicîla min ji bîr kiribin. Lê, hûn hin tiştan qet li pêş çavan nagirin. Hûn hin tiştan paşçav û paşguh dikin.

Ji ber vê axaftina heval, Heciyê Fars hêrs bû:

-Me çi paşçav û paşguh kiriye, heval?

-Hecî, mînak; ez bi berpirsiyartiya nû ya PKK'ê hatim gel we. Pewîst bû berpirsyarê me ye berê biçûya. Lê, hevalê din li vir, ligel min bimaya. We ew heval jî şand! Li vir ez ê tenê çawa bikim? Ez, tu deran û tu kesî jî nas nakim. Ma qey ev helwesta we rast û durist e? Di vê helwesta we de rêzgirtin heye? Ez di vê helwestê de, di sîstema Komara Îslamî de rêzgirtinê nabînim.

Ji ber bersivên heval, Heciyê Fars bêzar bû. Ji bo hîn jî xiçil nebe ji ber axaftinên heval, bi dengekî bilind û bi hêrs:

-Te, qet leşker û polîsên me kuştine, an na? Tu qet berê hatiye Îranê?

-Ez tu caran nehatime Îranê. Lewma ne pêkan e ku ez leşker, polîs an jî hin peywirdarên we yên din jî bikujim. Carekê tenê, ez neçar mame, derbasî axa we bûme.

-Kengî, ji bo çi tu derbasî axa me bû, heval? Tu di derî re yan jî di kîjan sînorê me û Tirkiye re derbasî axa Îranê bû?

Heval, bi serê xwe, Heciyê zikmeşk ê ku heval ji sînor heya bajarê Ûrmiyê anî, nîşanî Heciyê Fars da:

-Wexta ku Hecî ji sînor min wergirt û heya vir ez anîm, me li xwaringehekê taştê xwar. Li hinda wê xwaringehê çiyayekî asê heye. Em sê heval bûn û di wî çiyayê asê re serberjêr daketin. Piştre em di deştekê de çariyek xulek meşiyan. Piştî deştê di hewrazekî asê de em bi hewa ketin. Hevalekî me jî birîndar bû û me tu rê nas nedikirin. Ji ber wê jî, ji neçarî em her sê heval derbasî axa Îranê bûn.

-Hevalê we ji bo çi birîndar bibû û kî bû?

-Piştî ku Serokê me Abdullah Ocalan, bi komployek navnetewî ji aliyê hêzên dagirker ve dîl hate girtin, em nêzî çil hevalî ji Bakurê Kurdistanê, ji herêma Metîna dihatin daku derbasî herêma Soran bibin. Li ser sînorê we, em ketin kemîna leşkerên Tirk.

-Saet çend bû? We şehîd dan, an na?

-Berbanga sibê bû. Tava heyvê jî hebû.

-Şiklê kemînê çawa bû?

-Bi awayekî nîv hîlal kemîn danî bûn. Piştî ku em derbasî axa we bûn, li me dan.

-We qet şehîd, an jî birîndar dan, an jî na?

-Belê Hecî, me şehîdek da. Ew jî, hevalekî me yê Asûrî bû. Ew sax girtibûn. Bi êşkence ew şehîd kiribûn. Êşkenceyeke hovane lê kiribûn. Dil û çavên wî derxistibûn.

-Çend birîndarên we hebûn?

-Birîndarekî me hebû. Ew jî ji piyê xwe birîndar bibû. Em, ligel hevdu derbasî axa Îranê bûn. Heya êvarê xwîna birîna wî nesekinî, êvarî sekinî. Paşê jî bi rêka gundiyan me têkilî bi hevalên xwe re danî û em çûn gel hevalên xwe.

-Baş e. Em ê êdî xatirê xwe ji te bixwazin. Siberoj wê Hecî bajêr bi te bide nasandin.

-Baş e Hecî, ez bajêr nas bikim çêtir e.

Heciyê zikmeşk, heval heya mala komunê bir. Wexta ku xatirê xwe ji heval xwest, gote heval:

-Siberoj amade be, ez ê bajêr bi te bidim nasandin.

Siberoj saet heşt bû, Heciyê zikmeşk û dev li ken bi telefonê ji heval re got:

-Amade be, ez ê îro te li bajêr bigerînim, bajêr bi te bidim nasandin, ji bo ku tu zor û zehmetiyan nekişîne.

-Baş e hecî.

Piştî deh an jî çariyek xulek zenga deriyê xanî lê da. Heval derî vekir:

-Silav heval…

-Silav Hecî…

-Kerem bike Hecî; em rûnên, taştê bi hevdu re bixwin.

-Na heval, em biçin li xwaringehê taştê bixwin. Li vî bajarî serê sibê serûpê û avgoştê xweş çêdikin.

-Baş e Hecî.

Heval û Heciyê zikmeşk; nêzî bîst xulekan bi taksiyê di nava bajêr de geriyan. Bajêr hîn ne qelebalix bû. Hîn xelkê bajêr ji malên xwe derneketibûn. Ji ber vê yekê jî, zû gihîştin xwaringehê ku taştê lê bixwin. Heciyê zikmeşk berî garson ji heval pirsî:

-Heval tê avgoştê yan serûpê bixwî?

-Serûpê.

Heciyê zikmeşk paşê deng li garson kir:

-Ji bo me serûpê û avgoştê bîne.

-Ser seran, Hecî.

Bersiva garson û taştê anîna garson di heman demê de pêk hat.

Hecî û heval xwarina xwe xwarin. Rabûn ser piyan, heval pereyê taştê da. Heciyê zikmeşk, beriya ku heval pere bide garson, bêdil destê xwe avêt berîka xwe, lê heval bi lez berî wî pere dan.

Her du ji xwaringehê derketin ku bajarê Zerdeştê Kal lê ji dayîk bûye binasin, lê bigerin.

Heciyê zikmeşk gote heval:

-Em berê li nav bajêr bigerin, nêzî saetekê, paşê jî em biçin golê, tu çi dibêjî heval?

-Ez tu deran nas nakim Hecî; tu min bibî ku derê, tu dizanî.

Nezî saetekê li nav bajêr geriyan. Cihên ji heval re her tim pêwîst be nîşanî heval dan; rê, stasyon, kuçe…

Li hin cihan jî, Heciyê zikmeşk, heval agahdar û hişyar dikir. Li cihên leşker û polîsan ji heval re digot: Ev der cihên leşker û polîsan e, pêwîst e tu li cihên wisa yekcar negerî, wêneyên van deran qet nekişînî.

Heciyê zikmeşk çi digot; heval jî, bi serê xwe erê dikir.

Di nava bajêr de, tiştên ku bala heval dikşand baxçeyên fêkî bûn; baxçeyên sêv, xox, hirmî, mişmiş… Lê belê, li hêla din jî ji bo avakirina avahiyan birrîna baxçeyên daran bû. Li cihê daran êdî avahiyên ji betonê bilind bibûn. Li hêlekê bajêr mezin dibû; li hêla din jî xweza wêran dibû. Vê yekê heval dixist nava fikar û hizrên cuda cuda… Heval, xwe bi xwe re digot:

-Ma qey pêwîst e, ewqas ev baxçeyên bêhempa bi vî awayî bêne telefkirin? Ma qey, ewqas pêwîst dike ev bajar mezin bibe? Birrîna ewqas daran, ma wê xweza qebûl bike? Gelo rojekê dê xweza heyfa xwe ji yên ku wê hildiweşînin û wê qetl dikin pirs neke?

Dema ku heval li ser talankirina xwezayê diponijî, Heciyê zikmeşk gote heval:

-Em ber bi behrê (golê) ve biçin baştir e.

-Gotina te ye, Hecî.

Her duyan bi taksiyê berê xwe dan Gola Ûrmiyê. Destpêke berê xwe dan başûr-rojavayê golê, paşê jî berê xwe dan bakur-rojhilatê golê. Ser dahnê êvarê jî berê xwe dan Rojhilatê Ûrmiyê, cihê ku dêra Asûriyan a qedîm lê ye.

Hîna li gundan baxçeyên fêkî pir bûn. Derdora bajêr hemû baxçeyên fêkî bûn. Ji bo ku baran barîbû wê rojê kêm gundî di nava baxçeyan de dixebitîn. Hîna gundiyan baxçeyên xwe bi avahi-

yên betonê re neguherîbûn û kevneşopiyên xwe parastibûn. Baxçe û dehlên şîn, parçek ji jîyana wan bû. Lê, bajarî ne wisa bûn. Dîn û îmana hin bajariyan pere bûn. Ji bo ku bi lez û bez hin bajarî bêrîkên xwe biwerimînin, her tiştek difirotin. Çavên wan ji bilî pereyan tiştek nedidît. Lewre baxçe talan kiribûn, bajar bibûn çoleke ji betonê...

Li başûr–rojavayê bajêr, Heciyê zikmeşk ji heval pirsî:

-Em, li çayxaneyekê çayekê vexwin an na? Wexta nimêjê ye, ez ê nimêj jî bikim.

-Baş e,Hecî

Nêzî saetekê bi taksiyê geriyan, lê rastî tu çayxaneyan nehatin. Piştî saetekê rastî pîremêrekî hatin. Pîremêr zibilê axurê sewalê xwe diavêt. Heciyê zikmeşk ji pîremêr pirsî:

-Mamo, li van deran qet çayxane nîn in?

-Belê birazî, çayxaneya min jî heye, dikana min jî heye.

Pîremêrê ku axurê sewalê xwe paqiş dikir, bi destên xwe yê bi rêxa sewalan du çay û li rex çayê jî paste li ser sêniyekê ji mala xwe anî cihê ku heval û Heciyê zikmeşk lê rûniştîbûn, li ser masê danîn.

Wexta ku çavên heval bi destên wî yên gemar ketin, dilê heval rabû. Lê belê heval ji neçarî çay vexwar û paste jî xwar. Di wê kêliyê de di navbera Heciyê zikmeşk û xwediyê çayxanê de nîqaşeke balkêş dest pê kir:

-Hecî hîn bihar e, ji bo çi ava golê ewqas kêm e?

-Tu dizanî baran û berf pir kêm barî. Ji ber wê yekê ye.

-Hecî ji bo çi baran û berf kêm dibare? Zivistana borî berf yek car nebarî. Piçekî jî baran barî, lê bi barana ku barî jî gol tijî nabe. Tu, dev ji hişkbûna golê berde, ji bo ku sal wisa bê berf û baran diborin gelek nexweşî peyda dibin.

-Sedema vê yekê çi ye, Hecî?

-Li gorî fikra min, em xwezayê qetil dikin, xweza jî li me tê xişmê. Xweza ji yê ku wê talan dikin heyfa xwe werdigire. Li bajêr binihêre Hecî, her der bû beton. Berê her der baxçeyên fêkî bûn.

Heval û Heciyê zikmeşk ji çayxanê berê xwe dan Rojhilata Ûrmiyê, dêra Asûriyan. Rêya dêrê hinek qîr hinek jî şose bû. Lê, hîna baxçe û dehlên di rêka dêrê de û yên li derdora dêrê nehatibûn birrîn. Bi piranî baxçe, bax, dehl hîna li şûna xwe bûn. Ev der ango derdora dêra Asûriyan hîna nehatibû çol kirin. Dêr jî jixwe di nava bax û baxçeyan de bû.

Heciyê zikmeşk, ji berpirsyarê dêrê re got:

-Ev xweşmirov mêvanê min e. Dixwaze li dêrê bigere, pir ji cihê wisa yê qedîm hez dike.

-“Ser seran, ser çavan.” Û gazî yekî ku li dêrê dixebitî kir, bi zimanê Asûrî hin tişt jê re gotin. Zilamê xebatkar, bi serê xwe, gotinên berpirsyarê dêre êre kirin. Piştre ji heval û Heciyê zikmeşk re got:

-Bi fermo.

Pêşî derbasî cihê ku wêneyê Hezretî Îsa tê de bûn. Li devê derî xebatkar pêlavên xwe ji lingên xwe kirin. Piştre heval û Hecî jî pêlavên xwe ji lingên xwe kirin, derbasî mezel bûn. Di mezel de tiştê ku bala mirov dikişand, zindîbûna wêneyê Hezretî Îsa bû, tiştê dîtir jî paqijiya mezel bû.

Liv û tevgara xizmatkarê dêrê çawa bûna, heval û Heciyê zikmeşk jî wisa dikirin. Xizmetkar berê li ber wêneyê Hezretî Îsa sekinî, îşareta xaça Îsayiyan kir. Heval û Heciyê zikmeşk jî ew îşareta ku xizmatkarê dêrê kirî di heman demê de kirin. Paşê, xizmetkarê dêrê li cihê dîtir ê dêrê ew gerandin. Hin agahî dan wan. Gote wan:

-Ev der heft sed sal berê hatiyê avakirin.

Demeke din her du ji dêrê derketin û bêre xwe dan mala ku heval, êdî bi tena serê xwe lê bimîne.

Di rê de heval, li ser cihê ku Heciyê zikmeşk pê dane nasandin pir hizirî. Her dida hizra xwe, gelo ji bo çi, Heciyê zikmeşk ez nebirim dêreke Ermeniyan, mizgefteke Kurdan, sînagogeke Cihûyan? Di dilê xwe de heval got; ez jê pirs bikim dê baş be an na? Lê, di dilê xwe de heval biryar da ku ji Heciyê zikmeşk pirs bike û jê pirsî:

-Hecî ji bo çi, te ez nebirim dêr an jî cihekî dîtir ê Ermeniyan, mizgefteke Kurdan, sînagogeke Cihûyan?

-Heval, Ermenî hîz û diz in. Navbera me Azerî û Ermeniyan nexweş e. Wexta di şerê Simkoyê Şikakî de Kurdan û Ermeniyan pêkve, em Azerî qetil kirin. Li vir; Kurd sunî ne, em jî şîa ne. Lewra min tu nebir cihê Kurd û Ermeniyan. Vê gavê jî ji ber pirsgirêka Karabaxê, navbera Ermenî û Azeriyan nexweş e. Lê, navbera Komara Îslamî ya Îranê û Ermenistanê xweş e. Em Azerî, ji Ermeniyan hez nakin. Cih û warê Kurdan jî ez bi xwe kêm diçimê, ji bo ku ez karmendê îstixbaratê me, ez ji xwe ditirsim.

-Ji bo çi tu ji xwe ditirsî Hecî? Ma qey te gelek neheqî û zilm li Kurdan kiriye?

-Na heval. Min tu neheqî li Kurdan nekirî ye. Lê belê, tu dizanî vê dawiyê we PJAK da damezrandin. Milîtanên PJAK'ê û milîsên wan êrîşî me dikin.

Heval di dilê xwe de got:

-Seg bav, ez bawer im te çiqas zilm li Kurdan kiriye? Ez dizanim tu yekî çiqas zilmkar û bê rehm e.

-Cihê Cihûyan jî kes ji me naçiyê. Cihû bi piranî jî ji welatê me çûn. Sînagogên wan hemû girtî ne.

Li ber deriyê mala partiyê Heciyê zikmeşk, xatirê xwe ji heval xwest. Heval kir û nekir Hecî derbasî jor nebû. Heval derbasî jor bû. Lê belê, her li ser gotinên Heciyê zikmeşk difikirî. Ew gotinên wî yên di derheqê gelê Ermenî û gelê Kurd de kiribûn, heval xistibû nava fikarên xerab! Bi giranî gotinê ku di derheqê gelê Ermenî de kiribûn, pir giran hatibûn ji bo heval. Li gorî heval, gelê Ermenî li cîhanê gelê herî bi hiş û aqil, herî bi exlaq û herî paqij bû.

***

Tenêtî çi ye? Taybetmendiyên xwe çawa ne? Li ser mirov bandoreke çawa pêk tîne? Ji bo kîjan hest û hizran rê vedike? Wexta ku mirov di nava gel, heval, hogir û hezkîriyên xwe de be, hest û ramanên çawa di mirov de peyda dike? Wexta ku mirov di nava dijminê xwe de bi tena serê xwe bimîne hest û ramanên çawa di dil û mejiyê mirov de peyda dibin? Jixwe, yên ku heval ligel wan dima, dost bûn an dijmin bûn, ne diyar bû. Ji aliyê dîrok, erdnîgarî û qewmiyetê ve mirovên hevdu bûn. Lê belê, tu caran, wan qewmê heval ango qewmê Kurdan pêş nexistibûn, tu caran li hemberî mafê qewmê Kurdan di aliyê siyasî de rêz negirtibûn. Heta nirx û berhemên Kurdan ên siyasî, civakî, aborî, dîrokî desteser kiribûn.

Heta hin dîrokzanan û yê ku wek bavê dîroke tê nasîn Herodot, di derheqê vê mijarê de wisa nivisandiye: “Wexta Darayê mezin (Darîûs) bûye Împaratorê Persan, hemû destkeftên Kurdan ji dest wan girtiye. Heta Xwedayê Kurdan wek Xwedayê xwe pejirandiye.”

Ew Xwedayê bav û kalên Kurdan, Xwedayê Medan Xwedayê Pêxember Zerdeşt Ahura Mazda, wek Xwedayê xwe qebûl kiriye. Lê belê, panzdeh salan jî tu berhemên Zerdeştê Kal berhev nekirine. Berhemên giranbiha yên Zerdeşt… Gatayên Zerdeşt… Heta tê gotin ku panzdeh salan Dara, navê Zerdeşt qet neaniye ziman. Piştî panzdeh salan navê Pêxember Zerdeşt û berhemên wî

yên giranbiha berhevkirine û weşandine. Wexta ku sedema vê yekê ji Dara (Darîus) an jî ji peywirdarê wî hatiye pirsîn, bersiva wî, xeta an jî sûcê wan ji wê kiryara wan hîna kembaxtir bûye… Gotiye:

-Wexta destpêka damezrandina Împaratoriya me Persan, şer û pevçûn di hundir de û bi dijminê derve re zor bûn. Ji ber vê, me nikarîbû berhemên Zerdeşt berhev bikin an jî biparêzin…

Zerdeştê Kal, pêxemberê Xweda Ahura Mazda, Xwedayê qenciyê ye; tu caran, navê wî heya panzdeh salan bi lêv nekiribûn? Mirov di nava dewleteke wisa de bi tenê be, ji pewîstiyên biçûk heya pêwîstiyeke mezin dê çawa pêk bîne. Wê ji kê alîkariyê werbigire, eger ji aliyê fikir, raman û xebatê de hêza mirov têra hin tiştan neke, wê ji kê alîkariyê werbigire?

Tê gotin ku taybetmendiyên tenêtiyê Xwedayî ne. Ji bo çi taybetmendiyên tenêtiyê Xwedayî ne, lê ne Şeytanî ne? Heval, ev yek jî fêm nedikir. Di vê mijarê de her bi xwe re di nava nîqaşên giran de bû. Ji xwe re digot, ma qey wexta ku mirov tenê ma, mirov her tiştên baş difikire û dike? Ma qey mirov wexta ku tenê be tiştên ne qenc, qet nayên bîra mirov? Fikir, ramanên xerab di mêjiyê mirov de peyda nabin? Ev fikir û ramanên wisa rê li ber hin kiryarên ne baş, kiryarên ku mirov ji rê derdixin venakin? Taybetmendiyên tenêtiyê gelo Xwedayî ne an şeytanî ne? Heval hîna ev yek nedizanî bû. Dixwest ku bersiva vê yekê peyda bike, ji bo vê bersivê peyda bike jî pêwîst bû ku bi tena serê xwe bijiya…

****

Heval hefteyekê tenê ma, di nava hizir û ramanên baş û nebaş de... Car caran, tenê ji bo pêdiviyên xwe yê rojê derdiket derve, di heman demê de dizivirî mala xwe. Rojekê zenga telefonê lê da, heval rahişt telefonê:

-Alo! Rojbaş, silav û hurmet heval…

-Silav û hurmet, rojbaş Hecî.

-Tu çawa yî, heval?

-Sax bî, Hecî.

-Tu jî sax bî Hecî.

-Ez kêliyeke din li gel te me heval.

-Ser seran, ser çavan, Hecî.

Dengê Heciyê zikmeşk, bi heyacan û bi tirs bû. Lewma heval ket nav heyecan û fikaran… Hatina Heciyê zikmeşk dereng nekişand. Piştî telefonê, deh an jî çariyek xulek zenga deriyê hewşê lê da. Heval deriyê hewşê vekir, destê hevdu guvaştin. Heciyê zikmeşk ewqas bi heyacan û bi tirs xuyanî dikir ku, qet rewşa heval jî ne pirsî, hema dest bi axaftinê kir. Axaftineke bi tirs û heyecan:

-Heval, sê hevalên we bi hezên me yên ewlekariyê re ketine şer! Hevalekî we jiyana xwe ji dest daye! Ligel hevalê we yê ku jîyana xwe ji dest dayî, telefona hevalê we yê ku beriya te li vir peywirdar bû derketiye. Lewre, pêwîst e em deriyê vê malê qifil bikin û ji vê malê biçin maleke din.

Hecî ev axaftin ji heval re kir û çend caran jî xwe bi xwe bi dengekî bêzar, heyacan û tirs axifî:

-Me, çend caran ji wî hevalî re gotibû, me neke nava zor û zehmetiyên bi wî rengî! Niha, em ê çi bersivê bidin berpirsyarê xwe, berpirsyarê nûnerê dewleta xwe? Ya xerab jî; heval, em ê te çawa biparêzin?

Hecî hem bi vî rengî diaxifî, hem jî di mal de çavên xwe li tiştên qedexe, tiştên dibe ku ji bo wan pirsgirêkan peyda bikin digerandin. Pêlava mekab û çend pirtûkên ku li gorî qanûnê wan qedexe ye, Hecî xistin tûrikekî naylon, rahişt wan. Paşê ji heval re:

-Hemû deriyan qifil bike, lambeyeke elektîrîkê jî vekirî bihêle. Em bi lez ji vir biçin, heval!

-Baş e, Hecî.

Bi awayekî lezgîn, ji malê derketin, çûn taxeke ku di hewrazekî de ye. Li wê taxê çûn xaniyekî raxistî û vala. Di mezelê xanî de soba gaza xwezayî, televîzyoneke herêmî, makîneyeke faksê û hin nivîn hebûn.

Heval, ji nêzîkbûn û wî anîna bi vî rengî gelek bêzar bû. Lê belê, ji bo ku helwesta wan fêm bike, ev yek eşkere nekir. Ji vê helwestê gelek bi şik û guman bû. Gelo tiştên ku Heciyê zikmeşk digotin, rast û durist in, an dixwestin wî bixapînin û biceribînin ka heval kesayetek çawa ye? Ji tenêmayînê ditirse an jî natirse? Bi kêrî têkiliyên xwe tê, bi tekildarên xwe re bi kîjan awayan û kîjan rêkan têkiliyê datîne?

Du rojan, Heciyê zikmeşk û heval di wî xanî de ligel hev man. Hecî hema xwe li mezelê rûniştinê dirêj dikir û dinivist. Heval jî li mezelê mêvanan dinivist.

Di navbera her duyan de kêm axaftin pêk dihatin. Lê belê, Hecî her tim bi jina xwe re bi telefonê diaxifî. Qet lêdana dengê zenga telefona wî qut nedibû. Her bi jina xwe re, di telefonê de digot; “hezkiriya min, çend rojan karê min heye. Eger ku karê min xelas bû, ez ligel te me. Ez te hembêz dikim, çavên her du kurên xwe jî maç dikim.” Jina wî car caran telefon dida dest zarokan, zarok bi bavê xwe re diaxifîn. Piştî ku axaftin xelas dibû, Hecî bi dengekî bilind ji xwe re digot; “ez ê kîjan pêdiviyên van bikirim, kîjanan nekirim? Di vê mijarê de êdî ez jî şaş bûm.”

Heval ji helwesta Heciyê zikmeşk matmayî ma û jê pirs kir:

-Ma qey Hecî zorakên te, ji te pir tiştan dixwazin? Tu dibêjî, ez ji wan re çi bikirim, çi nekirim?

-Belê heval, yek hîna di dergûşê de ye. Lê, yek jî duwazdeh salî ye. Yê di dergûşê de hîna ewqas mesref li wî nabe. Lê, ew ê mezin ez perîşan kirim. Kengî ez ji dayîka wî re telefonê vedikim, hema

ji dest dayîka xwe telefonê digire, beriya ku li halê min bipirse, dibêje; bavo wî tiştî ji min re bikire, wî tiştî ji min re bikire. Êdî ez ji pêdiviyên wî bêzar bûm. Çavên wî çi dibînin, dixwaze; yekî pir çav birçî ye. Ez karmendekî dewletê me, meaşa min têra tiştên ku ew dixwaze nake.

-Vê wextê, zarok mezin kirin zor û zahmet e Hecî.

-Rast e heval, xaniyê min bi kirê ye. Hîna min xanî ava nekiriye. Ez bi kotekî debara xwe dikim. Ew kurê min jî çi li bazarê dibîne dixwaze.

-Hîna serwext nebûye, Hecî.

-Gotina te ye heval, hîna serwext nebûye. Pêwîst e, ez û dayîka wî, wî têbigihînin. Lê belê, ez bawer nakim ku em bi ser kevin. Ez nizanim, gelo nifşê niha hemû wisa ne? An jî xwedê ev bela daye me?

-Ez nizanim, Hecî. Ji ber ku ez hatim dinê, ez li çol û çiyan im. Ez tu caran jî nezewicîm. Hevalên me jî ji bo doza azadî û wekheviyê bi piranî nazewicin. Xwedê emrê zarokên te dirêj bike, Hecî.

-Xwedê ji te razî be.

-Ji te jî…

-Hecî, tu dikarî biçe mala xwe. Ez ê li wir tenê jî bimînim.

-Ma tu tenê natirsî?

-Na, Hecî. Ez natirsim. Apocî qet natirsin!

-Wê wextê, ez ê ber êvarê biçim cem zarokên xwe.

-Baş e, hecî.

Hecî danê êvarê xatirê xwe ji heval xwest û çû. Lê belê, beriya biçe dîsan ji heval re got:

-Heval, telefonê bi kar bîne.

Li ser vê gotina Heciyê zikmeşk, heval gelek aciz bû. Bi hêrs ji Hecî re got:

-Dînê Xwedê, ma qey min çend caran ji te re got? Telefona ku hevalên beriya min bi kar anîne, ew her du têlefon min dane yê telefon kirî... Heciyê zikmeşk li ser acizbûna heval xwe ker kir.

Heciyê zikmeşk ji cem heval çû. Heval bi tena serê xwe ma û li ser helwesta Hecî ponijî. Her da hizra xwe. Her helwesta Hecî di mejiyê heval de cihekî sereke digirt. Gelek pirs di mejiyê heval de, gelek hestên baş û nebaş jî di dilê heval de hebûn. Di mejiyê xwe de her nîqaş dikir; "ez ê di xeta Serokatiyê û şehîdan de tevbigerim. Bi rûyê spî, bi eniya xwe ya paqij ez ê wezîfeya xwe bi rengekî serkeftî pêk bînim û derkevim pêşberî Serokatî, şehîdan, gel û hevalên ku di nava xebatê de ne; bi taybêt hevalên gerîlla, hevalên ku li Kurdistanê dixebitin.

An jî bi awayekî rûreş, bi awayekî xwe belav kirî, bi awayekî kesayeta xwe neparastî, di nava gemara welatê ku lê wezîfedar de kesayet û wezîfeya xwe biqedanda"

Pirsên bi wî rengî di mejiyê heval de, hestên bi wî rengî jî di dilê heval de diçûn û dihatin.

Heval, bi vî rengî xwe li ser nivînan dirêj kir. Lê belê, her li ser anîna xwe ya vê derê difikirî. Hecî ji bo çi ew anîbû vê derê? Bi rastî, gelo heval hatibûn şehîdkirin? Bi rastî di bêrîka hevalêkî de, telefona hevalê beriya wî wezîfedar, hatibû girtin an jî ew xapandinek, dekûdolabek bû… Dibe ku dekûdolab be, dibe ku rast be jî. Heval bi vî rengî di nav nivînan de dirêjkirîbû; lê heya ku tava rojê di pencerê de li mezelê ku ew tê de nivistibû xist, ew di nav nivînan de gevizî ha gevizî…

Wextê taştê xwarinê Heciyê zikmeşk li zenga deriyê malê da. Heval, deriyê malê jê re vekir. Bi silavê derbasî jor bû. Jixwe ligel wan rojbaş kêm bi kar dianîn. Ji bo ku silav silava Xwedê bû, silavê cihê rojbaşê jî dadigirt.

Hecî ji heval re got:

-Em biçin li derve li xwaringehekê taştêya xwe bixwin; li vir serûpê jî û avgoştê jî xweş çêdikin.

-Bila bi dilê te be, Hecî.

-Beriya hefteyekê jî ez û tu em çûbûn cihekî, me hingiv û rûnê nivişk bi taştê re xwaribû. Dîsan em biçin wê derê çêtir e.

-Ji ber ku, li ser hevdu çûna cihekî nebaş e. Ji bo min jî ji bo te jî. Dijminê min jî zor in, çiqas hîn kesek te nas nake jî, ji bo te jî li ser hev çûna cihekî nebaş e, heval!

-Bi kêfa te ye Hecî…

Heval û Heciyê zikmeşk ji malê derketin. Li taksiya ku Hecî diajot siwar bûn, di nav bajêr de berê xwe dan xwaringehê. Ji ber ku sibe bû, hîn her der tenha bû. Lewma zû gihîştin xwaringehê. Hecî avgoşt xwar, heval jî serûpê… Heciyê zikmeşk bê dil destê xwe avêt bêrîka xwe; lê heval beriya wî destê xwe avêt berîka xwe, bi awayekî lezgîn pere ji bêrîka xwe derxistin, direjî garson kirin… Ji Hecî re jî:

-Di navbera min û te de tu ferq nîn e. Ha te pere dane ha min, ferq nake…

Hecî ji bo ku garson nasê wî bû, bi awayekî germ gote garson:

-Xweda Hafiz.

-Xweda Hafiz, Hecî.

-Heval îro min dixwest ku ez te li nava bajêr bigerînim, lê li daîreyê pir karên min hene, ji ber vê yekê bibexşîne. Ez ê rojeke din te bigerînim.

-Xem nake Hecî.

Heval li kêlaka Hecî, li taksiyê siwar bû, ber bi mala ku heval lê dimîne Hecî taksî ajot…

Di pêşiya sê avahiyên fermî re Hecî taksî ajot û heval re got:

-Ev avahî; yek a îstibaratê ye, yek a polîsan e, ya din jî ya leşkeran e. Tu li ber van deran qet negerî çêtir e. Di heman demê de nebe ku tu dîmenên wan deran bikişînî! Dîmenên van deran kişandin qedexe ye! Cezayê wê jî di zagonên me de giran e û li her derê van avahiyan jî kamera hene!

-Spas Hecî, ji bo agahî û hişyariyên te.

Heval li bêr deriyê mala partiyê ya komunê ji taksiyê peya bû. Wexta ku xatirê xwe xwest, Hecî gote Heval:

-Em ê danê êvarê biçin mala te. Nîvro jî ez ê ji bo te firavînê bînim.

-Spas Hecî.

Hecî ji nik heval çû. Heval dîsan ma bi tena serê xwe. Lê belê, ew roja ku heval êdî biçe mala xwe, ji bo heval ne rojeke bi weswese bû; rojeke bi hêsan û rojeke xweş bû. Heval, heya nîvro bêhna xwe veda… Lê, wexta ku Heciyê zikmeşk firavîn ji heval re anî, ew hêsaniya rojê, xweşikiya rojê, dîsan şûna xwe ji wesweseyê re hişt… Heciyê zikmeşk wexta ku hatibû cem heval, li devê dêriyê xanî piştî silavê ji heval re gotibû; “pêwîst e em mala te biguherin, pêwîst e em xaniyekî ku cihê wê ji bo ewlekariyê baş be ji bo te kirê bikin.” Her duyan bi hevdu re li ser maseyê sifre danîn, pêkve dest bi xwarinê kirin…

Wexta ku Hecî behsa guherandina malê kir, mirûzê heval ji nişkê ve tirş bû. Hecî, bi vê yekê hisiya û ji heval pirsî:

-Ji bo çi mirûzê te tirş bû, heval? Me, di xizmetê de hin kemasî kirin gelo?

-Na, Hecî. We di xizmetê de tu kemasî nekirin, ez ji we pir memnûn im. Min îsoteke pir tûj xwar ji ber vê yekê mirûzê min tirş bû.

-Min jî got, qey me di xizmetê de hin kemasî kirin. Eger ku dilê te naçe kebabê, ez biçim xwarineke din ji te re bînim.

-Spas Hecî; ez ji vê xwarinê gelekî memnûn im.

-Hecî depozîto û kirê çiqas e?

-Depozîto, pêkan e (gengaz) heft an jî heşt mîlyon tumen; kirê jî pêkan e ku sed an jî sed û pêncî hezar tumen be.

-Ma qey li her taxekê depozîto û kirê wek hevdu ne? Ma li hin taxan bihatir, li hin taxan jî ne erzantir e?

-Belê heval, li hin taxan depozîto û kirê ya avahiyan gelekî biha ye. Li hin taxan jî erzantir e. Li hin taxan jixwe kesên wek me nikarin rûnîn. Li wan taxan ên ku cuzdanê wan tije ne, dikarin rûnin.

Heval dev li ken ji Hecî pirsî:

-Ma çiqasî biha ne?

-Depozîto deh an jî panzdeh mîlyon tumen, kirê jî ji sê sed hezar tumenî heya pênc sed hezar tumen wê biçe…

Hecî ji cem heval çû. Heval ji ber depozîto û kirê pir bêzar bû. Jixwe ligel heval tene sê mîlyon tumen hebûn. Heval ji ber depozîtoyê ket nava fikaran. Dê ewqas pere çawa peyde bikira? Sê çar kesên ku hevalê beriya wî bi wî dabûn nasandin hebûn. Ji bo ku carekê yan jî du caran dîtibû cihê mala wan jî dernedixist. Eger ku malê wan derxistiba jî ka dê bi heval re alîkarî kiribana an nekiribana, ev yek jî hîn ne diyar bû. Ji hevalên xwe xwestin jî ne li gorî exlaq û nirxên wan bû. Pêwîst bû heval bi xwe mesrefê pêdiviyên xwe peyda kiriba. Wexta ku perê zêde bi dest ketin jî dê ew rê kiriba ji hevalên xwe re.

Di nava van hizir û fikaran de heval nizanîbû çawa wext derbas bû. Wexta ku Hecî bi telefonê xeber da û gote heval; “ez ê bêm te bibim mala te,” heval zanîbû ku roj çûye ava.

Hecî piştî çend xulekan hat li zenga deriyê hewşê da, gote heval; “em pêşî biçin li xwaringehekê xwarinê bixwin, paşê jî ez ê te bibim mala te.

Heval spasiya Hecî kir, gotê; “dilê min naçê xwarine, em biçin mala me çêtir e.” Hecî jî li gorî heval tevgeriya. Heval bir mala komunê. Li ber deriyê malê ji Heciyê zikmeşk re got:

-Kerem bike jor, Hecî.

-Spas heval; ez ê biçim malê, zarok li bendî min in.

***

Heval derbasî jor bû. Lê, pir bi fikar û weswese bû. Dilê wî nediçû xwarine, ne jî vexwarine. Televîzyon vekir. Lê, di televîzyonê de çi dihat weşandin, temaşe nedikir. Di televîzyonê de çi dihat axaftin, guhdarî nedikir. Heya derengiya şevê bi wî rengî li ber televîzyone rûnişt; li ser kursî. Her difikirî; “ez ê pereyê mala nû ya ku kirê bikim ji kê bixwazim? Ji ku derê peyda bikim? Ez biçim nik kê, ji kê pereyê kirê û depozîto bixwazim?” Ji ber vê yekê, wê şevê qet nenivist, heya sibê. Xwêdanê di pişta wî re avet. Di nava nivînan de her gewîzî û gewizî… Sibehê di dilê xwe de got; “ew du kes hene, ew kesên ku saya serê PKK’ê cuzdanên xwe miştkirî, cuzdanên xwe dagirtî… Ew kesên ku di her civatê de bi navê partî diaxivin û di civatan de dibêjin ku ji bo Serok Apo, PKK û Kurdistanê namûs jî tê de em ê her tiştekî xwe feda bikin…”

Sibehê wexta ku ji nav nivînan derket, çû destşoyê. Kêliyekê serê xwe da ber ava cemîdî. Çay ji bo xwe amade kir. Bi penêr û çend zeytûnan xwirîniya şikand. Berê xwe da ew her du kesên qaşo dostên PKK’ê ne… Ew kesên ku di civatan de diaxifin dibêjin; “em ê namûs jî tê de her tiştekî xwe ji bo Serok Apo, PKK, Gelê Kurd û Kurdistanê feda bikin.”

Heval, di wextên cuda de çû mala her du kesên qaşo dost. Her duyan jî wek hevdu heval pêşwazî kirin. Wexta ku heval dîtin,

bêdil pêşwazî kirin. Heta her duyan jî heval li ber deriyê mala xwe demeke dûr û dîrej, li ser piyan dane sekinandin. Bersiva her du hîz û dizan jî ji bo heval wek hevdu bû. Her duyan jî ji heval re gotin:

-Destê me gelekî teng e. Bazirganî qet nabe, em zarokên xwe bi kotekî, bi deynan xwedî dikin. Rewşa Îranê jî êdî li hemberî we ne baş e. Ji ber ku PJAK ji aliyê we de hate damezrandin, êdî çavên Komara Îslamî her li ser me ye. Tu bi xwe jî dizane, li Îrane dardekirin heye, ger tu jî êdî yekcar neyê mala me em ê kêfxweş û minetdar bibin. Tu ji me pereyan dixwaze; perê we pir in, ji hevalên xwe bixwaze hîn çêtir e.

Heval ji cem wan bi mûrizekî tirş rabû. Bêdil xatirê xwe ji wan xwest û berê xwe da mala ku lê dimîne.

Piştî ku helwesta wan kesên bi axaftinê dost, di kiryarê de dijmin û bi talûke bi çavên serê xwe dît û bi guhên wî jî bihîstin, barê heval hîn girantir bû: Ji aliyê hizir, fikar û kiryarê de… Heval her bi xwe re di nava nîqaşê de bû. Heval xwe bi xwe digot; "eger ku dostaniya wan ev e, bila ev dostanî di bin erdê keve, bila dostên wisa nebin, hîn çêtir e. Dijmin, ji dostên wisa çêtir e. Mirov dizane ku dijmin çi ye. Lê, mirov nizane ku kêngî zilamên wisa hîz û diz, helwesta wan li hemberî mirov dê çi be? Beriya helwesta wan a ku hem tu alîkarî ji heval re nekiribûn, hem jî rûyê xwe li heval badabûn, ji heval re gotibûn, "careke din neyê mala me." Heval ji wan gelekî bêzar bibû. Lê belê, piştî demekê heval ku hîna zêdetir li ser helwesta wan hizirî, bêzariya heval şûna xwe ji kêfxweşî ye re, ji dilşadiyê re hişt. Ango heval ew nas kiribûn, beriya helwesta wan a neyînî heval di bin bandora axaftinên wan de bû. Ew axaftinên wan ên ku digotin; "namûs jî tê, de em ê ji bo Serok Apo, PKK, Gelê Kurd û Kurdistanê her tiştekî bidin…" Heval bi xwe re di derheqê wan de êdî dev ji monologan berdida û êdî wan ji dijmin jî hîn bi tehlûke dihesibandin. Êdî heval qet ji wan bawer nedikir.

Heval bi wan hizir û fikaran li taksiyekê siwar bû. Lê piştî li taksiyê siwar bû, çend xulekan şofêrê taksiyê di bin çavan re her li heval dinihêrî û şofêr, dev li ken bi zimanê Azerî ji heval pirsî:

-Hesapları birbirine katıksan!(te hesap tevlihev kirine)

-Na Hecî, min hesap tevlihev nekirine! Ez îro pir xebitîm, ji ber vê ez gelekî westiya me.

Şofêr bi serê xwe wek bêje; ji her halê te diyare ku pirsgirêkên te yên kûr û giran hene, tu ji bo çi înkar dikî? Bi devkî jî ji heval re got:

-Bila bi gotina te be… lê, ji her tevgera şofêr eşkere bû ku ji bersiva heval ne îqna ye…

Şofêr, li cihê ku heval xwest ji taksiyê peya bibe, taksî da sekinandin. Heval ji taksiyê daket xwarê:

-Xweda Hafiz, Hecî.

-Xweda Hafiz, bira.

Di piyaderê de wexta ku heval ber bi mala xwe ve dimeşiya, çend kesên ku di piyaderê de dimeşiyan her li meşa heval dinihêrîn. Wexta ku heval bi vê yekê hisiya, xwest derbasî aliyê din ê rêka asfaltê bibe. Ji nişkê ve xwe avêt ser rêya asfaltê! Di wê kêliyê de taksiyekê hindik mabû heval bipelixîne! Şofêr taksî da sekinandin, bi zimanekî nerm ji heval re got:

-Bira ma tu dixwazî bimirî, tu ji canê xwe bêzar e? Tê serê min jî bi xwe re têxe belayê! Ewqas zarokên min hene, ma tiştek bihata serê te wê kê zarokên min xwedî bikirina? Vê carê tiştek nehate serê te, xwedê tu parast. Careka din ku tu di rêkan re derbas bû, ji kerema xwe re li derdora xwe binêre, piştre derbas bibe…

-Spas Hecî, gotina te rast e… Li min biborîne.

-Çi nîn e, bira… Min pêl te bikira, tu birîndar bibûya an jî te jiyana xwe ji dest bida, heya heyatê wicdanê min rehet nedibû.

Careke din di rêyan re wisa nemeşe.

-Careke din spas Hecî, min bibexşîne…

Heval, piştî vê bûyera ku hatibû serê wî û axaftinên giranbiha yên şofêr, xwe avêt mala xwe. Jixwe mala ku heval lê dima nêzîkî cihê bûyerê bû.

Heval, heya sibê li ser depozîto û kirêya mala nû hizîrî. Çend caran xwe di nava nivînan de dirêj kir. Lê, qet xewa wî nedihat. Kêlîyekê xilmaş dibû, piştre hişyar dibû. Yek caran derdiket hewşê digeriya. Bi vî awayî lê bû sibe. Çayek keland, bi hinek penêr û çend zeytûnan xwirîniya xwe şikand. Ji nişkê ve Zana û Zînê hate bîra wî! Hevalan ew bi wî dabûn nasandin. Ji bo tevgera azadîya gelê Kurd pir ked û berdêl dabûn. Her du jî canfeda ne. Ji bo azadiya gelê Kurd xebitîbûn û hîn jî dixebitîn. Wan ne tenê ji bo PKK'ê xizmet kiribûn; ji qaçaxçiyan heya hemû tevgerên dîtir ên Kurdan, ji fedayînên gel heya mucahîdên xelq xizmeta gelek tevgeran kiribûn. Ew hemû, li mala Zana û Zîne bibûn mêvan, xwarina wan xwaribûn. Li mala wan bêhna xwe vedabûn, di nava nivînên wan de nivistibûn. Sohbeta wan a xweş a ku mirov qet jê têr nabe guhdarî kiribûn. Jixwe her du jî wek hevdu zana û jêhatî bûn. Mirov ji axaftinên wan têr nedibû. Ji axaftinên wan pir gelek sûd werdigirt. Axaftinên wan pir giranbiha bûn.

Zana, Kurdekî ji binemalek Êzîdî bû. Zînê jî ji binemaleke Asûrî bû. Her du jî hatibûn ser dînê Misilmanan.Mirov di kesayeta wan de taybetmendiyên Êzîdiyan û Asûriyan jî didît. Zana yekî pir dilnizm, xweşbîn, jêhatî û wek navê xwe zana bû. Zînê, ji Zana jî zanatir bû. Mirov bêje, yek ji yê din zanatir bû, hîn çêtir e. Zînê, pir bi kêrhatî, çalak, dilnizm û destsivik bû.

Bejna Zana bilind, pişta wî zirav difna wî wek nikilê teyrê baz, xwînşêrîn û çîl bû. Ji alî bedewî ye di ser Zînê re mirov li derdora wê jin nedidîtin. Zînê esmer, lêvên wê tenik, eniya wê tevî ku dayika pênc zarokan bû jî, qet ne qurmiçî bû. Zîn tevî ku dayika du

kur û sê keçan bû jî wek bûkeke teze xuyanî dikir. Zewaca wan wek mirov hin darên fêkî bitamîne (aşilama), lêhatibû. Wek mirov darên sêvan, darên xoxan bitamîne lêhatî bû. Zarokên wan nîşana vê yekê bûn. Zarokên wan yek ji ya dîtir xweşiktir, zanatir û kêrhatîtir bûn…

Her astengiyên di jiyanê de derketibûn pêşiya wan jî bi feraset derbas kiribûn. Du kur û du keçan li Zankoya Ûrmiyê dixwendin. Keça wan a herî biçûk navê xwe Sîsê bû. Sîsê şeş salî bû. Lê, ewqas biaqil bû ku mirov digot qey mezin bûye, paşê dîsan bûye zarok. Jixwe tê gotin, dilê zarokan pir paqij e. Lê, dilê Sîsê di nava heft saliya xwe de herî paqij bû. Sîsê wek navê xwe sîs bû. Difna wê biçûk, çavên wê reşbelek bûn; nenûkên wê ewqas xweşik bûn ku mirov dixwest her li nenûkê wê binihêre. Dayik û xwişkên wê wexta ku karek dikirin, wê jî hema dest diavet wî karî. Mirov dixwest ku karê ew dixwaze bike, temaşe bike…

Heval di mejiyê xwe de bi wan şanasekirinên Zana, Zînê û zarokên wan ji mala xwe derket. Destê xwe li taksiyêkê bilind kir. Taksî sekinî. Heval gote şofêr, min bibe filan taxê. Şofêr bi serê xwe got heval; baş e, ez ê te bibim.

Heval, ji taxa mala komunê heya mala Zana û Zînê bi şofêr re qet ne axifî, ne jî li derdora xwe mêze kir. Her çavên heval li rêka asfalt bû. Heval wexta ku şofêr gotê; “em hatin taxa ku dibêje,” pê hisiya ku hatine taxa ku mala Zana û Zîne lê ye… Heval destê xwe avêt berîka xwe ji bo ku pereyên şofêr bidê; şofêr bi zimanê Azerî gotê, “qabilî yoxtur (naxwaze, pêwîst nake)”. Heval jî gote şofêr; tu zarokan xwedî dike, pereyan bigire. Heval ji şofêr re got:

-Xweda Hafiz. Şofêr bi vê gotinê heval bersivand û heval ji taksiyê peya bû. Berê xwe da mala Zana û Zîne… Nêzî mala Zana û Zînê deh panzdeh xulekan li derdora xwe nêrî. Heval, ji xwe wexta ku diçû serdana malekê her li derdora xwe dinêrî, ji bo ku bizane ka kes wî dişopînin an na. Bi wî awayî heval xwe li ber deriyê hewşa mala Zana û Zîne dît. Bi heyecan û bi coş li zenga deri-

yê hewşê da. Derî, Sîsê vekir. Heval bejna xwe xwar kir, her du hinarikên rûyê Sîsê maç kir. Sîsê bi lez û bez bazda jor, qet ji heval re negot tu çawa yî, tu baş î, jî. Jixwe Sîsê wexta ku heval didît, çend xulekan ji ber coş û heyacana dîtina heval nediaxifî. Vê carê jî wisa kir. Qet bi heval re neaxifî, berî heval di pêş de derbasî jor bû. Kûmandaya televîzyonê girt dest xwe, her kanalê televîzyonê dizivirand.

Wexta ku heval ket hundirê malê dayîka Sîsê û xwîşk û du birayên Sîsê li malê bûn. Beriya hemûyan dayîka Sîsê Zînê, bixêrhatina heval kir, bi hemû heza xwe destê heval guvaşt, paşê xwîşk û birayên Sîsê.

-Tu bi xêr hatî heval, tu çawan î?

-Sax bî. Hûn çawa ne, Zana û zarok çawan e?

-Şêrên serê çiyan çawan e?

-Hemû vê gavê bê bela ne. Rewşa wan baş e.

-Gerîlla her tiştekî me ne, dil û canê me ne.

-Sax bî. Hemû baş in. Zana jî derket derve, bêhneke din ê were. Karekî wî hebû. Ji min re gotibû ez ê zû werim, eger kesî pirsa min kir, bila li mal, li bendî min bimîne…

-Jixwe ez ê jî li bendî wî bimînim.

Zîn jineke gelek fêhman bû. Di heman demê de ji heval pirsî:

-Wek pirsgirêkeke te, derdekî te heye?

-Belê, derdekî min heye; lê belê ez çawa vebêjim, ez jî nizanim…

-Dostanî û hevaltî ji bo çi ye? Eger em bi hevdu re nebin alîkar, em ê çawa Kurdistanê rizgar bikin û gel jî azad bikin?

-Gotina te di cih de ye.

-Kerem bike, tu derdê xwe ji min re vebêje. Dibe ku em ji derdê te re bibin çare, heval…

-Ez ê, mala xwe biguherim. Ew mal êdî eşkere bûye. Lê perê min têrê nakin. Ew du kesên qaşo dostên me hebûn; ew ên ku bi bazirganiyê re mijûl dibin. Ez çûm cem wan, ew pereyên ku pêwîstiya min pê heyî min ji wan jî xwestin. Lê wan hem tu alîkarî nekirin, hem jî rûyê xwe li min badan. Gotin, “careke din neyê mala me!”

-Ew ên hîz û diz? Ew ên ku li ser pişta PKK’ê cuzdanên xwe dagirtine! Ew ên ku li civatan dibêjin; namûs jî tê de her tiştekî me ji bo Serok Apo, PKK û Kurdistanê ye?

-Belê; ew ên ku tên nasîn, xwîşka min Zînê.

Heval û Zînê wexta ku bi hevdu re diaxifîn Sîsê jî qet rehet nedisekinî. Her kanalê televîzyonê diguherand. Çend caran dayika Sîsê jê re got, “Keça min wisa meke, ûz (rû girtin) nabe. Tu heval bêzar dikî.” Lê Sîsê qet nedisekinî.

Ji neçarî Zinê, kûmandaya televîzyonê ji dest Sîsê girt. Sîsê mirûzê xwe tirş kir, li ser kursî rûnişt. Di wê kêliyê de Zana ket hundir. Ber bi heval çû, bi hemû hêza xwe destê heval girt û hembêz kir. Ji parsûyên heval dengê qirçeqirçê hat; lê heval ji nêzikatiya Zana pir kêfxweş û dilşad bû.

-Ji zû ve tu nehatibû cem me. Ji bo te em ketin nava fikaran. Lê belê me tu dît. Bi dîtina te em pir kêfxweş bûn. Hûn çawan e? Heval çawan in? Bi taybet şêrên serê çiyan çawan e?

-Spas heval Zana. Vê gavê hemû bê bela ne. Li hemberî neyaran jî gelek serkeftin bi dest xistine. Hevalên gerîlla duh şev bi telefonê bi min re axifîn.

-Ew êrîşa ku gerîllayên azadiyê li dîjî Oremarê pêk anîne, piştre li Zapê têkçûna hêzên leşkerî yên dewleta Tirk, li hember hemû dagirkerên Kurdistanê serkeftinên mezin û dîrokî ne ji bo ge-

lê Kurd. Ev serkeftin dê bandoreke êrenî li ser dagirkerên me jî bike. Ez bawer dikim ku li ser dagirkerên parçeyê me jî kir.

-Bi gotina te ye bira, ez jî wek te difikirim. Êrîşa Oremarê, destana ku gerîlla li Zapê bi xwîn û ked nivisandiye wê bandorê li dagirkeran bike. Bi taybet wê bandorê li dewleta dagirker a Îranê bike. Di vê mijarê de ez jî wek te difikirim.

-Ez bawer dikim ku Îran di dema pêş de wê siyaseta xwe ya di derheqê PKK'ê de di pêş çavan re derbas bike, paşê jî biguhere.

-Gotina te ye birayê min ê ezîz, Zana.

-Ez bawer dikim; piştî ku Serok Apo dîl hate girtin û radestî dewleta Tirk hate kirin, Îranê bawer kir ku PKK dê tesfiye bibe. Lê belê êdî Îran jî dibîne ku PKK her bi hêz dibe… Ji ber vê yekê ez dibêjim, Îran dê siyaseta xwe ya halê hazir a di derheqê PKK'ê de di pêş çavan re derbas bike, dê siyaseteke nerm bide meşandin, heval.

-Nirxandinê te dibe ku rast û durist bin. Mijara nirxandina siyaseta Komara Îslamî qet ne eşkere ye… Lê, ez bawer nakim wek berê Îran nêzîkî me bibe. Dibe ku siyasetên hişk jî bide meşandin yan nerm jî…

-Ji bo çi wek berê nêzîkî me nabe, heval?

-Wexta ku têkiliyên me û Îranê xurt bûn, PJAK nehatibû avakirin. Ji ber vê yekê êdî Îran wek berê nêzîkî me nabe. Di derheqê me de wê her di nava şik û gumanan de be…

-Parçeyekî Kurdistanê; hem jî parçeyê piştî Bakurê Kurdistan, parçeyê Kurdistanê yê mezin di bin dagirkeriya Îranê de ye. Heta bi sed salane di bin dagirkeriya Îranê de ye… Ji hilweşandina dewleta Medan û wir de, di bin dagirkeriya Îranê de ye…

-Belê, bi sed salane parçeyekî welatê me di bin dagirkeriya Îranê de ye. Îran, ji bo berjewendiyên xwe gelek caran bi tevge-

rên Kurdên parçeyên dîtir ên Kurdistanê re alîkarî kiriye. Lê belê ji bo ku Kurd azad bibin ev alîkarî tu caran nekiriye. Ji bo ku cîranê xwe yên wek Iraqê, wek Tirkiye lewaz bike, ev alikarî kiriye. Wexta ku, tevgerên Kurdan, kijan tevger dibe bila bibe, ber bi serkeftinê çûye, Îranê bi dewletên wek Iraq, wek Tirkiye, bi dewletên dagirker re peyman îmze kiriye, bi hevdu re tevgerên Kurdan tesfiye kirine.

-Wek serhildana Şêx Ubeydûllah.

-Belê kek Zana, gotina te ye. Serhildana Şêx Ubeydûllah ji, di nav serhildanên gelê Kurd de serhldaneke bêhempa, bi navûdeng û sereke ye. Armanca wê serhildana Şêx Ubeydûllahê Nehrî serxwebûn bû. Beriya ku bi ser bikeve, bi alîkariya împaratoriya Safawiyan ku bi împaratoriya Osmaniyan re kiribûn, dîl hate girtin. Împaratoriya Osmaniyan jî, Şêx Ubeydûllah sirgûnî Hîndîstanê kiribûn. Ez, bawer dikim ku Şêx Ubeydûllah, li wê derê jiyana xwe ji dest da…

-Belê, heval. Serhildana Şêx Ubeydullah ji Şemzînanê dest pê kir. Tê zanîn ku Şemzînan warê bav û kalê min e. Hîn jî mirovên me, gundê me û zewiyên me li Şemzînanê ne.

-Ez dizanim kek Zana, Şemzînan warê we ye.

Wexta ku heval bi Zana û Zîne re diaxifî, Sîsê qet nedisekinî. Sîsê yek caran diçû metbexê firax dişûştin; ji bo ku bala dê, bavê xwe û heval bikşîne ser xwe gelek deng ji firaxan derdixist. Yek caran firax li hev didan. Teqereq a firaxan nedihişt ku dê û bavê Sîsê û heval ji axaftinên hevdu têbigihîjin. Sîsê, dest ji firax şûştinê berda, vê carê li bisîkletê siwar bû. Di cihê ku heval, dê û bavê wê lê rûnîştî de bi bisîkletê diçû û dihat, diçû û hat… Dê û bavê Sîsê ji ber rêzgirtina heval qet bi ser Sîsê de nediheytandin. Jixwe her du jî gelekî bêhnfireh bûn. Tu caran li zarokên xwe nediheytandin. Li wan nedidan. Yek caran dayîka Sîsê, yek caran jî bavê Sîsê jê re digotin:

-Keça min ûz (rû girtin) nebe. Heval aciz neke… Lê belê Sîsê heya ku heval, dê û bavê wê êdî dev ji axaftînê berdan û bi pê re mijûl bûn, hat li kêleka heval rûnişt. Bi heval re dest biaxaftinê kir. Wek yeka mezin dest bi axaftinê kir. Mirov digot qey Sîsê mezin bûye, paşê jî biçûk bûye:

-Heval bav û dayîka min pir xizmetê mezin kirine ji bo gerîlla. Carekê, beriya vê bi çend salan yekî ji nav refên gerîlla baz dabû. Bavê min bi taksiya xwe bi dû wî ket, ew girt û nehişt teslîmî hêzên ewlekariyê bibe. Ew girt, radestî hevalan kir. Wê wextê hêzên Îranê bi wê bûyêre hisiyabûn, reqemê plaka taksiya bavê min girtibûn. Bavê min, ew taksiya ku bi pênc milyon tumenî kirîbû bi milyonek tumen firot.

Sîsê nedixwest ku tenê pesnê bavê xwe yan jî pesnê dayika xwe bide. Wexta ku pesnê bavê xwe dida piştre jî pesnê dayîka xwe dida. Ji bo ku dilê wan ji Sisê nemîne, dilê xwe negirin.

-Heval, dayika min jî gelek caran tiştên teqemeniyê di bin kincên xwe de li canê xwe girê didan, ji bo hevalan dibirin. Carekê min bi çavên serê xwe dît; sê sed funye di bin fîstanê xwe de, li laşê xwe gire dan û ji bo gerîllayan bir çiyan.

-Sîsê, tu çend salî ye?

-Şeş, heval.

-Bi Farisî şeş çawa tê gotin?

-“Şîş” tê gotin heval.

Wexta ku heval û Sîsê diaxifîn, dê û bavê Sîsê jî axaftina wan bi baldarî guhdarî dikirin.

Wexta ku axaftina Sîsê û heval bi dawî bû, dayika Sîsê dev li ken:

-Keça min tu şeş salî yî, ew ziqûmê ku baz da, ew ê ku bavê te bi dû ket, girt û paşê radestî hevalan kirî, bawê te jî ji neçarî tak-

siya xwe bi erzanî firot, berî niha bi heşt salan qewimî.

Sîsê, ji wê axaftina dayîka xwe xiçil bû, xwe ker û lal kir. Êdî, heya ku heval ji wan xatirê xwe xwest qet neaxifî.

Beriya ku heval xatirê xwe bixwaze Zana jê pirsî:

Heval ji bo te ji bo pêdivîyên te, çiqas tumen pêwîst in?

-Ez bawer dikim ku nêzî çar-pênç milyon tumenê min hene, sê milyonên din jî hebin dê tera pêdiviyên min bikin.

Zana çû ji mezelekî din dirav anîn, dan dest heval. Ji heval re got:

-Eger ku têrê nekir, were ez ê hinên din jî peyda bikim.

-Spas kek Zana.

Heval, yek bi yek destê hemûyan guvaşt, hinarikên rûyê Sîsê jî maç kir. Zana, Zîne û Sîsê heya ber deriyê hewşê heval bi rê kirin.

***

Heval ji mala Zana derket. Ewqas kêfxweş bû ku qet li taksiyê jî siwar nebû, wek bayê kur bi peyatî xwe avêt mala xwe. Di rê de qet li wêneyan, li mirovan û li wesaîtan jî temaşe nekir. Bi vî awahî xwe avêt mala xwe ya komunê; mala ku heval bi tena serê xwe lê dimîne…

Ji êvarî heya derengiya şevê li ber televîzyone ma. Heval helwesta Zana, Zînê û ew her du hîz û dizê ku di civatan de digotin, namûs ji tê de her tiştekî me ji bo Serok Apo, ji bo PKK û ji bo Kurdistanê gorî ye dida ber hev.

Heval wê şevê bê fikar nivist. Sibê tava rojê da pencerê xaniyê wî, ji xew hişyar bû. Jixwe wexta ku tava rojê deh panzdeh werîs bilind dibû, li pencera ku heval tê de dinivist dida. Ji ber vê yekê heval zû hişyar dibû. Piştî taştê dest bi kar û barê xwe yê rojane dikir. Bi piranî bi şev ji bo karên xwe yê rojane nexşeya xwe çedi-

kir. Lê, wê rojê tu nexşe ji bo xwe nedanîbûn. Heval ji bo pereyên depozîto û kirê peyda kiribûn, pir kêfxweş bû. Di dilê xwe de digot, îro ez derkevim li nava bajêr bigerim. Heval gera li nava bajêr di dilê xwe de dibir û dianî ku, zenga telefona wî lê da:

-Silav heval tu çawa yî? Ez piştî çariyek din li nik te me.

-Ser seran, ser çavan Hecî.

Nexşeya ku heval, di dilê xwe de ji xwe re danîbû, bi telefona Heciyê zikmeşk di ber dilê heval de mabû… Heval ji ber ku wê rojê Heciyê zikmeşk li pêşiya gera wî bibû asteng, gelekî ji Hecî bêzar bibû. Bêdil, li benda Heciyê zikmeşk ma…

Hecî, hate mala heval. Piştî hal û xatirê hevdu pirsîn, gote heval; em ê îro mala te biguherin.

-Mal li ku derê ye, Hecî?

-Li taxeke bi ewle ye.

-Depozîto çiqas e, Hecî?

-Pênç mîlyon tumen.

-Kirê çiqas e, Hecî?

Wexta ku Hecî, perê depozîto û kirê ji heval re gotin, êdî heval bêhna xwe berda… Ji bo ku perê heval têra depozîto û kirê dikirin.

-Em, biçin mala we ya nû. Eger ku tu pê qayîl bû, em ê perê xwediyê malê bidinê û îro jî tiştên we bikşînin mala nû…

-Baş e Hecî…

Heval û Hecî, ji bo Hecî mala nû nîşanî heval bide derketin derve. Jixwe mala nû nêzî mala kevn bû. Bi taksiyê di deh panzdeh xulekan de gihîştin mala nû. Mala nû ewqas mezin bû ku têra malbateke qelebalix dikir. Hewşa mala nû ewqas mezin bû ku mirov dikarîbû tê de fûtbolê bilîze. Di hewşê de, darê fêkiyên wek

dara tû, hêjîr, xox û mêw ên tirî hebûn. Avahiya nû du qat bû. Rê di kêlekê re diborî. Tu kêmasiyên avahiyê tune bûn. Kalorîfer jî tê de, her tiştekî avahiyê hebû. Ji bo hevalê ku bi salan di nava şert û mercên giran de jîyayî re, ev avahî wek qesrekê bû. Hevalekî bi salan di kokê daran, di bin kevir û zinaran de yek caran jî di bin baranê de, bê betanî û bê parke û bi qetek naylon jîyayî re wek qesrekê dihat.

Jiyana heval û jiyana hevalên wî, vê gavê di pêş çavên wî re wek fîlmekî diçû û dihat. Jiyana heval ku li Bakurê Kurdistanê, di nava bajaran de borî jî, jiyana wî ya şoreşgerî jî her li pêş çavên wî wek fîlmekî diborî…

Heval di nava van xem û xiyalan de dûr çibû; Heciyê zikmeşk, gotê:

-Ez bawer dikim tu çû çiyan cem hevalê xwe û tu vê gavê zivirî…

Heval dev bi li ken:

-Rast e Hecî. Hevalên li serê çiyan hatin bîra min…

-Em biçin mala we ya kevn, ez ê biçim karkeran jî bînim. Wexta ku karker hatin tu di mezelekî de rûnê, bila te nebînin… Heya ku ez bi wan re zivirîm, tu, tiştên ku em ligel xwe bibin, tiştên em radestî karkeran nekin amade bike, em ê ligel xwe bibin…

Heval û Heciyê zikmeşk, bi hevdu re ji mala nû derketin, berê xwe dan mala kevn a komunê… Hecî li ber deriyê malê, heval peya kir. Gote heval:

-Tu derbasî jor be… Ez ê, biçim karkeran bînim.

Hecî çû. Nêzîkî nîv saetê li nik xwe bi deh karkeran ve zivirî. Li zenga malê da. Heval derî jê re vekir û derbasî mezelê ku karker wî nebînin bû…

Karkeran di sê çar saetan de hemû tişt birin mala nû. Wexta

ku karkeran tişt veguhestin mala nû, heval di mezelê ku xwe veşartî de qet neliviya. Piştî ku mal hate vala kirin, Heciyê zikmeşk hate cem heval:

-Me, hemû tiştên malê birin. Ez jî ligel karkeran, wexta tişt dibirin, her carekê çûm û hatim… Me, mala te jî raxist. Êdî, em tiştên ku li vir mayî jî biavêjin taksiyê û em jî biçin…

Heval û Hecî, rahiştin tiştên ku radestî karkeran nekirine; avêtin paşiya taksiyê… Heval, di kursiya pêş de rûnişt, wêneyê Serok Apo jî kir hembêza xwe… Hecî çend caran di bin çavan re li heval nihêrî û nihêrî, paşê jî ji heval pirs kir:

-Heval, ew çi ye? Te, bi hemû hêza xwe ew hembêz kiriye?

-Wêneyê Serokê me ye…

-Bixe ser kursiya dawiyê…

-Ez wisa nakim, Hecî. Em ji her aliyekî deyndarê Serokê xwe ne. Ger tiştên malê hemû jî wenda bibin, heta ku hemû jî bên dizîn, ji bo min jî ji bo hevalên min jî xem nake. Lê ev wêneyê Serokê me bikeve, bişke an jî wenda bibe wê wextê ez xwe efû nakim…

-Ez, bawer dikim ku tu jî wek hevalên xwe gelekî dilsozê Serokê xwe ye.

-Belê Hecî, ez dilsoziya xwe nikarim vebêjim…

-Heval tu dixwazî li kîjan mezelî wêneyê Serokê xwe deynî?

-Mezelê ku ez ê tê de bixebitim û di heman demê de jî tê de razêm.

-Baş e, ez ê bi te re bibim alîkar. Em wêneye Serokê we deynin cihê ku tu dixwazî.

Bi alîkariya Heciyê zikmeşk, heval wêneyê Serokê xwe danî cihê ku ew her tim bibîne.

Ji bo ku heval bi tenê bû, ji bilî Zana û Zînê jî kesî din ên ku heval di rojên tengav û giran de bi wan bişewiriya hîna tune bûn; heval, di dilê xwe de xwe bi xwe digot:

-Bila her awirên Serok li ser min bin, da ku ez tu kemasiyan nekim…

Piştî wêneyê Serok bi cih kirin, heval ji Hecî re got:

-Hecî, em biçin bi hevdu re şîva êvarî bixwin. Ji bo xwarin û vewarinê Heciyê zikmeşk gelekî çilek bû. Wexta ku behsa xwarinê dihate kirin, Heciyê zikmeşk her tim hazir û nazir bû.

-Bi dilê te ye, heval…

Heval û Hecî bi hevdu re derketin derve, Hecî ji heval pirsî:

-Em biçin kîjan xwaringehê?

-Kîjan bi dilê te ye em biçin wê derê.

-Em biçin pîzza bixwin çêtir e…

-Baş e Hecî.

Heciyê zikmeşk, heya ber xwaringeha pîzzayan di nava bajêr de, heval gerand. Derbasî xwaringehê bûn. Beriya ku garson were daxwaza wan pirs bike Hecî ji heval pirsî:

-Tê pîzzaya mezin bixwî an ya biçûk?

Heval, ji bo ku çilekiya Hecî dizanîbû, gote Hecî:

-Tu kijanê dixwe, ez ê jî wê bixwim.

Di wê kêliyê de, garson hate cem wan. Gote her dûyan kerem bikin, daxwaza we çi ye, hûne çi bixwin, çi vexwin?

Hecî got garson, "du pîzzayên mezin û ji bo min dewekî," berê xwe jî da heval:

-Tê çi vexwî?

-Ji bo min jî dew.

Garson pîzza anîn. Hecî, zendê xwe ba da û heya anîşkê ket ser pîzzayê. Hîna heval pîzzaya xwe bi nîvî nekiribû, Hecî pîzzaya xwe xelas kir. Heval gote Hecî:

-Yeka din bixwaze.

Ligel Hecî ji aliyê xwarin û vexwarinê qet şerm tune bû. Wexta ku xwarin dihat pêşiya wî, nedigot ku "ka ne ya min e; lê kadîn jî ne ya min e?" Ji ber vê yekê zikê wî wek meşkekê lê hatibû.

Heval û Heciyê zikmeşk, pîzzayên xwe xwarin. Bi ser de dew vexwarin. Çûn cihê kasiyer. Hecî dest avêt berîka xwe; lê destê Hecî qet ji bêrîka wî derneket. Heval ji bêrîka xwe pere derxistin, dan kasiyer û her du ji pîzzavan derketin. Bi taksiya ku Heciyê zikmeşk diajot berê xwe dan mala ku, heval tenê tê de dimîne…

Di rê de Heciyê zikmeşk ji heval re got:

-Sibe ez û Hecî Selîm em ê bên serdana te…

-Ser seran ser çavan, Hecî

***

Heval, qet ji Hecî Selîm hez nedikir. Wexta Hecî Selîm diaxivî mirov digot qey segek direyê. Ji ber vê yekê, heval qet nedixwest ku Hecî Selîm bibîne. Lê belê, yek caran ji neçarî bi wî re rû bi rû dima. Jixwe kêfa Hecî Selîm jî qet ji heval re nedihat…

Sibehê, Hecî Selîm û Heciyê zikmeşk, hatin nik heval. Heval pê hisiyabû ku Hecî Selîm, bê sebeb nayê serdana wî nake. Heval bixêrhatina her duyan kir. Heciyê zikmeşk ji bilî pirsîna hal û xatirê heval di vê hevdîtinê de qet neaxivî. Jixwe ligel wan adet bû; yekî payebilind ku bi yekî payenizm re diçûn serdana yekî, her ê payebilind diaxivî. Ligel heval jî adeta wan wisa bû. Hecî Selîm diaxivî, Heciyê zikmeşk jî jê re fêkî diqeşartin. Lê, wê rojê Hecî Selîm ne fêkî xwarin, ne jî tiştek vexwar. Her mirûzê wî tirş bû.

Beriya ku ji cem heval rabin; Hecî Selîm ji heval re got:

-Em ê rabin. Êdî tu jî divê ligel me nemînî; tu biçe, bila hevalekî din bê cihê te…

Wexta ku Hecî Selîm gote heval, "tu biçe, bila hevalekî din bê cihê te," xwîn herikî mejiyê heval. Heval pir hêrs bû û gote Hecî Selîm:

-Ji bo çi ez ji vir diçim? Hîna sê heyvên min jî nebûne ku ez hatime vê wezîfeyê. Hevalê ku beriya min ligel we peywirdar bû du salan li nik we ma. Ji bo çi ez ê di demeke kurt de ji vir biçim? Sedema vê yekê pêwîst e tu ji min re vebêjî? Ev helwesta we ne ez; ne jî hevalên me yên din qebûl nakin.

-Di navbera me û we de peyman wisa ye. Tu qet alîkariyê bi me re nakî. Tu qet agahiyan nadî me. Bi taybet jî di derheqê PJAK'ê de.

-Em Apocî tu caran li nirxên xwe xiyanetê nakin! Em biçin ku derê jî em ê dîsa bi rûmeta xwe bijîn. Ji bo ku ez li vir tenê dimînim, tu dixwazî dekûdolaban li ser serê min bizivirînî? Eger ku di navbera me û we de peymaneke wisa heye, hevalên ku beriya min li cem we peywirdar bûn ji bo çi bi salan li vir man?

-Kîjan hevalên we yên wek te bi salan li vir peywirdar ma ne?

-Mînak, heval (...), heval (...)?

-Ew ne rast e, kes li cem me bi salan nemaye.

Heval têgîhişt ku Hecî Selîm û yên din jî naxwazin heval li cem wan bimîne. Lê, heval dixwest ku sedema vê yekê bizanibe, careke din Ji Hecî Selîm re got:

-Ez dixwazim sedema vê yekê bizanibim. Ji bo çi hûn dixwazin ez jî vê derê bi lez biçim? Bi taybet jî ji bo çi tu dixwazî ez ligel ve nemînim, hema yekser biçim? Tenê ez dixwazim sedema vê yekê bizanibim?

-Tu qet bi me re nabî alîkar. Tu agahiyan nadî me, bi taybet di derheqê PJAK'ê de. Ne cihê wan, ne jî dixwazin çi bikin, çiqas hêza PJAK'ê heye? Qet tu agahiyan nadî me? Ji ber vê yekê, em dixwazin tu ji cem me biçî, yekî din bê cihê te.

Wexta ku Hecî Selîm ev gotin ji heval re got, heval pir bêzar bû. Bi hêrs ji Hecî Selîm re, wek li Hecî Selîm biheytîne gote wî:

-Ma qey ez ji we re sîxurtiye bikim? Ma, hûn di derheqê xwe de agahiyan didin me ku ez di derheqê me de agahiyan bidim we? Ew tiştên ku tu dibêjî, di pirtûka me de nehatiye nivisandin. Ez ê, hema ji hevalan re xeberê bişînim. Bila hevalekî ji bo cihê min amade bikin. Ez ê bi lez ji cem we biçim.

-"A baş, ev gotina te ye". Û Hecî Selîm rabû ser piyan; destê heval jî neguvaşt, bi şiklekî bêdil ji heval re got; bi xatirê te. Ew li pêşiyê, Heciyê zikmeşk jî li dû wî ji malê derketin, çûn.

***

Piştî çûyîna her du ziqûman, heval li ser helwesta wan a neyînî pir hûr û kûr bû. Heval her li ser helwesta wan ponijî, ponijî... Lê, qet tênegihişt ku ka ji bo çi jê re dibêjin; ji vir biçe, bila hevalekî din bê cihê te... Di vê helwesta wan de heval tiştêk têgihiştibû; ew jî wan bi serê zimanê xwe bi lêv kiribûn. Daxwaza ku Hecî Selîm ji heval kiribû agahî bûn. Dixwestin bi taybet di derheqê PJAK'ê de agahiyan ji heval bistînin. Ev daxwaza wan, ji bo heval nepêkan (gengaz) bû.

Heval, wê rojê biryar da ku sibe biçe cihê şêwrê, mala Zana û Zînê. Wexta ku heval di mijarekê de asê dibû û çare nedidît, ji bo şêwrê diçû cem Zana û Zînê. Mala Zana û Zînê, tenê ne cihê şewrê bû ji bo heval. Di heman demê de cihê coş û dilşadiyê jî bû.

Deriyê hewşa malê ji heval re Sîsê vekir. Sîsê, wê rojê xwe xemilandibû, wek gulekê bû; wek guleke xweşik. Fanîlek li xwe kiribû, lê du sê xulekan carekê her milê fanîlê ji ser gurmiskên milê

xwe dişemitand; ji bo ku heval jî bibihîze digot; "ax! ax! Heval hûn nizanin, em li Îranê çi dikişînin. Nahêlin em azad kincan li xwe bikin, nahêlin em xwe bixemilînin." Ji gotin û helwesta Sîsê, heval matmayî dibû, lê pir jî ji zekîbûna wê kêfxweş dibû. Heval çend caran hinarikên rûyên Sîsê maçî kirin. Sîsê ji heval re got:

-Heval, li malê mêvan hene; bila te nebînin, heya deh xulekan wê rabin. Li embara qût bisekine. Dema ku mêvan rabûn, ez ê werim. Ez û tu, em ê bi hev re derbasî jor bibin…

Sîsê, çû jor. Heval jî di embara qût de heya ku mêvanên wan rabûn, li ser çewalekî birincê rûnişt. Mêvan, ji jor rabûn. Dayîka Sîsê û Sîsê jî ligel mêvanan heya ber deriyê hewşê mêvan bi rê kirin. Lê, dayîka Sîsê her kêliyekê; ji her du mevanên jin re digot hîna zû bû, hûn rûniştibana. Her ku dayîka Sisê ji mêvanên xwe re digot; hîna zû bû hûn bimana, Sîsê jî ev gotina dayîka xwe dubarê dikir…

Piştî ku mêvan ji hewşê derketin û çûn, dayîka Sîsê û Sîsê jî li dû hev hatin cihê ku heval xwe lê veşartibû. Dayîka Sîsê, bi hemû hêza xwe destê heval guvaşt, bixêrhatina heval kir, hal û xatirê wî û yê hevalan pirsî...

-Sax bî. Hemû heval bê bela ne.

Heval li pêş, Sîsê li dû heval, dayîka Sîsê jî li dû Sîsê derbasî jor bûn. Heval li ser kursiyê rûnişt. Li hêla jor Zînê, li jêr jî Sîsê rûniştin. Zinê careke din ji heval pirsî:

-Hûn çawan e, bê bela ne?

-Belê. Em, bê bela ne û em pir jî bi serkeftî ne. Piştî çalakiya Oremarê û Berxwedana Zapê em pir kêfxweş in…

-Em jî bi serkeftina hevalan kêfxweş in…

-Birayê min Zana li ku ye, wê dereng were?

Berî dayîka xwe, Sîsê, heval bersivand. Sîsê wexta ku heval

pirsek dikir, ji bo ku bala heval bikşîne ser xwe hema yekser bersiv dida heval:

-Bavê min, wê çend xulekên din bê. Em ê bi hevdu re biçin di nava gulên xweşik de wêneyên xwe bigirin. Heval tu jî ligel me were ku em, bi hevdu re wêneyên xwe bikşînin.

Heval qet nedixwest ku Sîsê aciz bibe. Sîsê, li ber dilê heval pir hêja û giranbiha bû. Sîsê ezîza ber dilê heval bû. Ji bo dê û bavê xwe jî Sîsê ezîza ber dilê wan bû. Sîsê, li ber dilê wan jî pir giran bû…

Di wê kêliyê de bavê Sîsê, Zana ket hundirê odeyê. Bixêrhatin kir û bi hemû hêza xwe heval hembêz kir. Hal û xatirê hevalan û heval pirsî:

-Heval çawan e, bê bela ne?

-Spas, hemû heval bê bela ne…

-Tu çawan î? Bi ziqûman re çawa derbas dikî? Di navbera te û wan ziqûman de hîn jî pirsgirêk hene? Ji te razî ne, an na?

-Razîbûna çi! Lewma ji min re dibêjin; ji vir biçe, bila hevalekî din bê cihê te.

-Ji bo çi wisa dibêjin?

-Min jî ev sedem fêm nekir. Lê belê, dibêjin tu qet agahiyan nadî me. Bi taybet di derheqê PJAK'ê de… Lê belê; ez bawer nakim tenê sedem ev be.

-Ez jî ne bawerim, ku sedem tenê ev be, heval. Hin agahî hatin guhên min!

-Hin agahiyên çawa kek Zana?

-Ew ên ku têne zanîn, ên ku li te rû badane! Ew ên ku dibêjin, namûs jî tê de her tiştekî me ji bo Serok Apo, ji bo partiyê(!)… Bi şev û roj karmendên dewletê diçin malên wan. Pêkan e wan di

derheqê te de hin agahiyên ne baş dabin wan…

-Rast e, kek Zana. Ez, beriya vê bi çend rojan, çûm mala yekî ji wan. Li wê derê min gotibû; “ez bawer nakim ev karmendên ku bi me re bi navê wan dixebitin, agahiyên ku em didin wan rast û durist rê dikin paytextê…”

-Ez niha têgihîştim ka ji bo çi dixwazin tu ji vir biçî û hevalekî din were şûna te.

-Bi te, sedema sereke ew gotina min e?

-Belê heval! Ew gotina ku te gotiye; “ez bawer nakim, ev kesên ku em agahiyan didin wan rast û durist rê dikin paytexta xwe.” Ez bawer dikim ew kesên ku bi saya serê partiyê bi qasî dinyayê bûne xwedan mal, milk û sermiyan…

-Ango, ew ên hîz û diz. Ew ên ku ji bilî cuzdan û doxîna wan tu nirxên mirovatiyê ligel wan nemane.

-Belê, heval…

Di dema ku heval û Zana bi hevdu re diaxifîn, Sîsê jî xwe kerr û lâl kiribû. Li ser mehfûr, di quncika odê de rûniştîbû. Lê belê, mirûzê wê pir tirş bû. Çavên bavê Sîsê wexta bi Sîsê ket û dît ku mirûzê wê pir tirş e, ji Sîsê re got:

-Karxezala min. Ji bo çi li wî quncikî xwe kerr û lal kiriye? Ji bo çi rûyê karxezala min tirş e? Were cem min…

Sîsê bi awayekî kelagîrî hat cem bavê xwe. Bavê Sîsê, hinarikên her du aliyên rûyê Sîsê maçî kirin. Lê, ji bo ku daxwaza Sîsê ji aliyê heval û dayîka wê nehatibû pejirandin pir bêzar bibû. Ji ber vê yekê peyv ji devê Sîsê dernediketin. Dayîka Sîsê, berê xwe da Sîsê:

-Keça min a delal xwe xemilandi ye da ku em bi hevdu re biçin di nava gulên xweşik de wêneyên xwe bikşînin. Lê dibêje bila heval jî ligel me bê.

-Ez û heval jî em naxwazin karxezala min bêzar bibe. Xwe li me ragir e, keça min. Heval wê şal û şapika min li xwe bike. Heval dê şaşikekê bide serê xwe û berçavkekê jî em ê bidin heval û em ê bi hevdu re biçin wêneyên xwe bikşînin, bizivirin…

-Ji bo çi heval şal û şapika bavê min li xwe dike? Ji bo çi berçavkê dike ber çavên xwe? Ji bo çi şaşikê dide serê xwe? Ez vê yekê halî nabim?

-Eger heval kincên xwe neguhere û dijmin jî heval ligel me bibîne, wê dijmin mala me wêran bike, gundê me jî kevl bike. Dijminê me dijminêkî bê rehm û hov e.

-Ez halî bûm dayê (min fêm kir).

Zînê şal û şapik, şaşika Zana û berçavkek anî dan heval. Heval, di heman demê de xwe amade kir. Her çar bi hevdu re; heval û Sîsê li kursiya paşiyê de, Zîn jî li kursiya pêşî rûnişt. Di çûn û hatinê de, kêm bi hevdu re axifîn, carekê Zana ji heval re got:

-Heval, eger di rê de hinekan ji te pirsî; bêje, "ez di rê de li vê taksiyê siwar bûm."

-Baş e, kek Zana.

Carekê Sîsê ji heval, cihê ku gerîlla tê de dimînin pirsî:

-Heval, cihê ku gerîlla tê de dimînin çawan e? Wek vê derê xweşik in, asê ne?

-Belê, wek bihuştê ne.

-Ma qey tu çûyî bihuştê?

Wexta ku Sîsê ji heval re got; "ma tu çû bihuştê", heval ji pirsa Sîsê matmayî û şermezar bû. Nikarîbû bersivê bide Sîsê. Heval, ji bo ku Sîsê hin pirsên din neke, bi dil û can ji Sîsê re:

-Li wî bajarî, keçika herî xweşik kî ye?

Wexta ku heval ji Sîsê ev yek pirsî, hem ji kêfxweşî û hem jî ji

şerma rûyê Sîsê sor bû. Vê carê jî Sisê heval ne bersivand…

Her çar di nava gulên xweşik de wêneyên xwe kişandin. Gulên xweşik û Sîsê ewqas li hev dikirin, ewqas bi ser hevdu ve bûn ku Sîsê ji gulan jî xweşiktir bû. Piştî wêneyên xwe kişandin, hema zivirîn bajêr. Di rê de, qet bi hevdu re neaxifîn. Lê belê, wek di çûyînê de, di zivirandinê de ji her sê; heval, dayîk û bavê Sîsê bi tirs û fikar bûn. Tenê Sîsê, ne bi tirs û fikar bû. Tirs û fikara wan û ya heval ew bû ku, polîs an jî leşker di rê de nasnameya heval pirs bikin. Lê, di rê de kesî ew nedan sekinandin, bê bela heya bajêr hatin. Heval, nêzî mala komunê ya yek kesî, destên dê û bavê Sîsê guvaştin, hinarikên rûyê Sîsê maçî kir û deriyê taksiyê nîv vekirî, li Zana zivirî berê xwe da Zana:

-Kek Zana; beriya ku ez ji taksiyê peya bibim, ez dixwazim ku di derheqê mijarekê de tu min agahdar bikî…

-Kerem bike heval…

-Behsa sêzdekê tê kirin, li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê? Ev sêzdek çi ye? Wate ya wê çi ye? Ji bo çi xelkê vir wê rojê derdikeve çolê?

-Heval, sêzdek; sêzdehê heyva nîsanê ye. Wateya wê ev e; xelkê me bawer dike ku, roja sêzdehê nîsanê rihekî xêrnexwaz, rihekî xerab dikeve malan… Gelê me jî ji bo ku ew rihê xêrnexwaz û xerab nekeve malan, wê rojê li çolan dimîne, derdikevin çolê.

-Spas ji bo agahiyên te, kek Zana.

-Em, li sêzdekê; ango sibe diçin Geliyê Qasimlo, heval.

-Bila, kek Zana

***

Serê sibehê, beriya ku tava rojê bide pencera odeya lê dinive, heval ji xew rabû. Nivînê xwe rast kir. Ji bo di taksiyê de bîzê wî

venebe, bi taştêyek sivik xurîniya xwe şikand. Ji mala komunê derket û berê xwe da cihê ku Zana û Zînê li benda wî ne.

Heval gihîşt wê derê û dît ku Zana û Zînê di taksiyê de li benda wî ne. Ji bilî Zana û Zînê, kurê wan ê biçûk Nebaz û Sîsê jî di taksiyê de bûn. Heval bi gotina, “rojbaş!” li taksiyê siwar bû.

-Hûn çawa ne? Hûn bê bela ne?

Berî hemûyan Sîsê, heval bersivand:

-Tu sax bî heval. Em hemû bê bela ne. Tu çawa yî?

Piştî bersivandinê, Zîne û Zana bêrê xwe dan Sîsê û keniyan… Sîsê ji bo ku berî dê, bav û birayê xwe Heval bersivand şerm kir. Spîtiyâ rûyê Sîsê winda bû, bi carekê spîsor bû. Lê, ji bo ku Sîsê hîn zêdetir xiçil nebe, dayîka wê ji heval re got:

-Keça min wekîla me ye, dikare bi navê me hemûyan bersivê bide, heval…

Ji bo ku xelkê bajêr sêzdehê nîsanê berê xwe dabûn çolê, di derketina bajêr de wesaît wek moriyan diçûn û dihatin. Mirov ji wesaîtan ax biavêta hewayê li erdê nediket…

Ji derketina bajêr heya Geliyê Qasimlo, Zana her Mihemed Arifê Cizrawî dabû ser teybê. Hemûyan bi kêfxweşî li Mihemed Arif guhdarî dikirin. Carekê du caran Zînê gote Zana:

-Êdî Mihemed Arif bes e; em Eyşe Şan guhdarî bikin, ne çêtir e?

-Ji ber ku Mihemed Arif mêr e, tu dixwazi îlehî em dengê jinekê guhdarî bikin, ne wisa?

-Na, bi serê Sîsê. Ez jî ji dengê Mihemed Arif pir hez dikim. Lê, ji derketina bajêr heya vê derê te her Mihemed Arif bi me da guhdarkirin, vê carê jî bila Eyşe Şan be.

-Min fêm kir ka ji bo çi tu Eyşe Şan dixwazî.

-Ji bo çi ez dixwazim tu Eyşê Şan bide ser? Bêje, ku em jî bizanibin.

-Ji ber ku ew jin e, tu cinsiyetparêziyê dikî.

-Tu ji min cinsiyetparêztir î. Eger ku ne wisa bûya, ji bo çi ji kengî de em Mihemed Arif guhdarî dikin?

Nêzîkî nîv saetê Zana kaseta Mihemed Arif neguherand. Piştî nîv saetê kaseta Mihemed Arifê Cizrawî ji teybê derxist, a Eyşe Şan xist şûnê.

Wexta ku Zana kaseta Eyşe Şan da ser, Zîne dev li ken gote Zana:

-Ez dizanim, tu ji min zêdetir ji dengê Eyşe Şan hez dikî. Lê, tu ya di dilê xwe de vedişêrî…

-Ji bo çi, ez ji dengê Eyşe Şan hez dikim? Gelo ji bo ku ew jin e, ji ber wê yekê?

-Belê, ez wisa difikirim.

-Ango, ez ji dengê te jî pir hez dikim? Tu dibêjî, "tu ji dengê jinan pir hez dikî. Wê wextê, tu ji dengê min jî hez dikî." Jixwe sîh sal in dengê te ez gêj kirim.

-Bila bi ya te be Zana Efendî! Gotinên te ne jidil in. Tiştê ku devê te dibêje dilê te nabêje.

Piştî van gotinan Zînê axaftina xwe qut kir. Ji ber ku Zînê axaftina xwe qut kir, Zana jî bêdeng bû.

Demekê kes bi kesî re neaxivî. Lê, ev bêdengî dema Zînê bi kurê xwe Nebaz re axivî bi dawî bû.

-Nebazê min; ji bo çi tu bê deng î, ji bo çi qet tu naaxifî?

-Ez, we guhdarî dikim. Naxwazim bi taybet axaftinên te û bavê xwe bibirim. Ez pir pê kêfxweş dibim, gelek jî jê sûd werdigirim. Di paşerojê de ev nîqaşên we wê bi min re bibin alîkar.

-Kurê min; tu tevlî nirxandinên min dibî, yan nirxandinên bavê xwe? Tu ji dengê keçan hez dikî an ji dengê xortan?

Nebaz ji şerma bersiv neda dayîka xwe.

Axaftina Zînê bi kurê xwe Kawayê Nebaz re bi dawî bû. Heval, berê xwe da Zînê û wateya navê kurê wê pirsî;

-Xwîşka min, ez wateya Kawa dizanim. Heta wek hemû Kurdên serwext ez jî dizanim ku Kawayê Hesinkar e. Ji bo çi dibêjin Kawayê Hesinkar, ez wateya wê jî dizanim. Lê belê, çima hûn ji kurê xwe re dibêjin Kawayê Nebaz, ez wê nizanim? Hûn dikarin wateya Nebaz ji min re vebêjin?

-Ji ber ku Kawayê Hesinkar tu caran xwe ji şer nedida paş, lewma Kurd ji Kawa re dibêjin, "Kawayê Nebaz".

Heval, li ser vê gotina "Nebaz" çend xulekan hizirî. Di nava xwe de, xwe bi xwe ev mijar nîqaş kir. Tiştekî xerîb e. Hemû zanayên şer, kesên ku emrê xwe bi şer derbas kirine dibêjin ku, şer fêlbazî ye. Lê, Kurd jî pesnê kesên ku di şer de xwe nadin paş didin…

-Kekê Zana, ji bo çi ji Kawayê Hesinkar re gotine Kawayê Nebaz?

-Ez bawer im, wexta ku Medan bi gelên dîtir ê bindest re li dijî împaratoriya Asûr şer dikirin, serdest û dagirkerên wek Asûriyan şer bi fêl û fenan didan meşandin. Ji ber ku, jiyana wan li ser fêl û xapandinê bû. Jiyana Medan jî li ser rastî û duristiyê bû. Di jiyana wan de xapandın û hîle tune bû. Jiyanek wisa bandora xwe li ser şêwazê şerê wan jî kiribû…

-Baş e, kekê Zana. Lê, piştî ku Medan împaratoriya Asûr hilweşandin û li dijî dagirkeriya Asûriyan bi ser ketin, careke din mirov di dîrokê de serkeftinek Kurdan nabîne. Di şer de serneketina Kurdan mirov divê çawa binirxîne?

-Heval, ez bawer dikim ji Medan heya roja me ya îro Kurd, bi piranî dûrî dewletê sekinîne. Lewma dûrî hîle, xapandin û derewan jî sekinîne.

-Ango tu dibêjî, hîle, derew û xapandin şêwazên dewletê û yên çînên serdest in?

-Belê heval.

Piştî axaftina di navbera heval û Zana de, yên di taksiyê de, heya pêşiya Qesra Qasimlo kes qet bi hevdu re neaxifîn.

Zana, li pêşiya Qesra Qasimlo taksî da sekinandin. Hemû ji taksiyê peya bûn. Zana ji heval re got:

-Em derbasî nava qesrê bibin, tê jî qesrê bibîne. Zînê, li dijî vê derket û gote mêrê xwe:

-Ma te aqlê xwe xwariye! Çawa heval bi me re li nava qesrê bigere! Yek derkeve şeytaniyê bike, wêneyê me û heval bikşîne, wê mala me û ya heval jî wêran bibe!

-Ji bo çi mala me û ya heval dê wêran bibe?

-Yên ku li vir wêneyan bikşînin, an şeytanê dewleta Îranê ne, yan jî, ji bo berjewendiyên xwe wê me jî û heval jî bifiroşin dewletê. Ez dibêjim, bila heval dîsan li taksiyê siwar be da ku kes wî nebîne.

Di wê kêliyê de Sîsê ku heta wê wextê qet nediaxifî, gote bavê xwe:

-Rast e, bavo. Ez jî dibêjim bila heval dîsan li taksiyê siwar be…

-Baş e keça min; bila bi ya te û dayika te be.

Li ser gotinên Zana, heval li taksiyê siwar bû. Heya ku malbata Zana ji Qesra Şehîd Qasimlo derketin bala heval li ser qesrê bû. Lê fikra wî çûbû ser tevgera Qasimlo. Heval, xwe bi xwe li ser si-

yaseta Îranê û tevgera Qasimlo dihizirî… Di dilê xwe de digot; siyaseta Îranê ya di der heqê Kurdan de ez bawer dikim ev e: Kurd bê serî hiştin e. Çawa ku bi kuştina Qasimlo di heman demê de Kurdên Rojhilat bê serî hiştine… Qesra Qasimlo jî bi wî rengî bê xwedî hiştine… Heval di nava van hizir û fikaran de bû ku Zana û malbat ji Qesrê derketin, ber bi taksiyê ve hatin. Li taksiyê siwar bûn. Lê belê, her çar jî mîna ku çûne maleke lê şîn hebe devê wan venedibû… Mirov digot qey her çar jî çûne sersaxiya miriyekî, çûne mala şînê…

Zînê li kêleka Zana, li pêşiyê rûnişt. Berê xwe da heval:

-Gotinek bav û kalên me heye, dibêjin: ‘Serî nebe, tu qîmeta dest û piyan nîn e.’ Wexta ku ez ketim Qesra Qasimlo, ev gotin hat bîra min. Bi şehîdkirina Qasimlo, Îranê Kurdên Rojhilatê Kurdistanê bê serî hiştin… Qesr jî bêxwedî hiştin û kes li Qesrê nanêre. Heya demekê Qesr wê wisa bimîne, dawiyê jî bi xwe hilweşe… Siyaseta Îranê ji bo Kurdan wisa ye; Kurdan bê serî bihêle da ku di demekê de birizin, tune bibin…”

Ji Qesra Qasimlo heya cihê ku wê heta êvarî lê bimînin Zana taksî ajot. Lê, ji ber ku gelek mirov hatibûn seyranê, rêka deh-panzdeh xulekan nêzî saetekê ajot. Geliyê Qasimlo ji ber sêzdekê bi mirovan tijî bû. Gel, bi kincên xwe yên rengareng derketibûn seyranê. Geliyê Qasimlo jixwe rengîn bû; lê mirovên ku derketibûn seyranê gelî hîn zêdetir rengdar kiribûn. Geliyê Qasimlo di sêzdekê de wek cihê dawetê bû. Hinek kesan li ber dahol û zirnê dîlan girtibûn, govend digerandin. Hinekan jî pez ser jê dikir, xwarin çêdikirin. Zana, ji cem malbata xwe û heval rabû çû. Li cihekî digeriya ku ba jê negire û tevî malbatê karibin heya êvarê lê rûnên. Piştî çend xulekan zivirî hat. Zînê jê pirsî:

-Ma te cihekî xweş dît an na? Îro em ê gelek şeperze bibin, zehmetiyê bikêşin…

-Malbata Rehîm jî hatine seyranê. Cihê wan xweştir e, em ê

biçin cem wan.

-Rehîm? Ew ê ku du caran zewiciye, ne wisa?

-Belê. Ew ê ku navê jina wî ya mezin Rehîma, navê jina wî ya biçûk jî Medîne ye.

-Wê wextê, em biçin.

Hemû rabûn, ber bi cihê ku malbata Rehîm lê dimîne meşiyan. Dema gihiştin wê derê Rehîm li pêş, malbat jî hemû bi dû wî de yeko yeko destê heval û destê malbata Zana û Zînê girtin, bixêrhatina wan kirin. Paşê Zînê çû cihê ku jin lê rûdinên. Heval, Zana û kurê wî Kawayê Nebaz jî çûn cihê zilam lê disekinin. Sîsê jî li wan deran şivek a ji dara biyê di dest de, ji xwe re digeriya. Ji nişkê ve dengê zilamekî bi bilindahî û bi hêrs hat. Zilam, destê jina wî di dest de, bi ser Sîsê de qîr kir:

-Wisa neke! Ma dê û bavê te li ku derê ne? Te berdane çolê û kî di pêşiya te re dibihure tu vê şivika ji darê biyê li wan didî!

Li ser vê gotinê, Zana bi hêrs ji cihê ku lê rûdinişt rabû, çû ji zilam lêborîna xwe xwest. Ji zilam û jina wî re got:

-Ew keça min e, li me biborin… Zarok e. Hîna ne serwext e, tiştên baş û nebaş ji hev dernaxe.

-Xem nake keko… Zilam hinarikên rûyê Sîsê ramûsand û Sîsê hembêz kir. Paşê jî ji jina xwe re got: Înşellah Xwedê keçek wisa bedew bide me jî.

-Înşellah…

Zana ji zilam re got:

-Ez bawerim hûn nû zewicîne. Xwedê we bextewar bike. Xwedê zaroken ji Sîsê xweşiktir bide we…

-Bila zarokên wek Sîsê bide me, em ji Xwedê tiştekî din naxwazin. Ji ber ku Sîsê ji gulên xweşik jî xweşiktir e…

-Hûn sax bin, Xwedê mirazê we hasil bike…

-Keko, em biçin cem me. Çayeke me vexwe.

-Keko spas. Em ê li nav van baxçeyan bigerin, bi xatirê we…

-Oxira xêrê be.

Zana bi destê Sîse girt û hat cihê ku heval, Rehîm û zilam lê rûdinên. Rûniştin. Sîsê jî, li ber çoka bavê xwe rûnişt. Zana, keça xwe Sîsê ber bi hembêza xwe ve kişand, bi hemû hêza xwe ew guvaşt. Sîsê hem ji şerma, hem jî ji guvaştina bavê xwe sipîsor bû. Spîtiya rûyê wê wenda bû. Ji ber ku rengê Sîsê sor û spî bû. Zana û Zînê navê Sîsê li keça xwe kiribûn. Bi Kurdî ji keç an jî jinên sorspî re dibêjin, Sîsê. Ji xortan an ji mêran re jî dibêjin, Sîso…

Zana ji Sîsê re got:

-Keça min; eyb e, şerm e! Ji bo çi tu diçî ji paş ve, li jin û mêrê xelkê didî. Baş bû ku ew jin û mêr mirovên serwext bûn. Xwe zêde aciz nekirin. Baş bû ku di navbera me û wan de tu nexweşiyan rû neda. Eger zarokekî wek te wisa bike, di navbera min û wî zilam û jina ku te lê dabû gengaz bû ku pevçûn derbiketa…

Sîsê wexta ku axaftinên bavê xwe guhdarî kir hîn sortir bû. Ji hembêza bavê xwe hêdîka rabû. Bavê wê jê pirsî:

-Bi ku de, keça min?

-Ez ê biçim cem dayîka xwe.

-Baş e keça min a delal, biçe. Lê belaya xwe di kesî nede.

-Baş e bavo.

Ji bo ku ba kincên wê raneke hewayê û rahnê wê xuya neke Sîsê, bi kincên xwe girt û çû.

Li pêşiya cihê ku rûniştibûn jin, bûk û keçên Rehîm xwarin çêdikirin. Zînê jî, destpêkê alîkariya wan dikir. Paşê dev ji alîkariyê berda, hate cem zilaman rûnişt. Ji her halê Zînê diyar bû ku ji

Rehîm aciz bûye. Zana, hêdîka jê pirsî:

-Ji bo çi te alîkariya wan nekir?

-Du jin, sê bûk û sê keçên wî yên li ber zewacê hene; lê dîsan jî ew xwe di ber karê jinan re dike. Ji ber vê ez aciz bûm. Min dest ji alîkariya wan berda. Zana hêdîka jê re got:

-Te, baş kiriye…Xwarina mala Rahîm çi ye?

-Xwarina ku çêdikin , goştê kelandî û birinç a. Hem Rehîm xwe tevlî karê wan dike, hem jî bayê dijwar jin, bûk û keçên Rehîm bêzar dike.

Xwarin ango firavîna malbata Rehîm, piştî nîvro saet sê amade bû. Lê, di serî de jin, bûk û keçên Rehîm; ji yên ku li ser sifrê amade bûn tu kes ji wê xwarinê razî nebû. Xwarineke şor û bê tam, goştekî nekelî… Her kesekî li ser sifrê, xwarina Zînê ya ku li malê amade kiribû û bi xwe re anîbû xwarin. Hinekan ji bo ku dilê malbata Rehîm nemîne çend parî ji xwarina wan a nekelî xwarin.

Danê êvarê xatir ji hev xwestin. Ber bi bajêr bi rê ketin. Ji ber ku di rê de wesaît pir bûn dereng, lê bê bela gihîştin bajêr… Cihê ku diviya heval ji taksiyê peya bibe, Zana ji heval pirsî:

-Heval em te li ku deynin, tê li ku peya bibe?

-Kekê Zana, ev cihê nêzîkî mala me ya komunê. Ew cihê tê zanîn!

Zana gihişt wî cihê ku heval jê re gotibû.

-Ez ê, li vê derê peya bibim.

Zana, taksî da sekinandin. Heval di nav wesaîtê de yek bi yek destê hemûyan guvaşt. Hinarikên rûyê Sîsê jî maç kir û destê xwe dirêjî deriyê taksiyê kir; Zînê dev li ken ji heval re got:

-Sibe, were cem me. Du jin ka çi tînin serê mirov, di vê mijarê

de ez ê nerînên xwe ji te re vebêjim…

-Baş e. Sibe, eger tu karê min dernekeve, ez mêvanê we me… Carek din bi xatirê we, êvarbaş…

-Êvarbaş…

Bi gotina êvarbaş a Zana re heval deriyê taksiyê vekir, li jêr û jora rêka asfalt nêrî û ji taksiyê peya bû.

***

Qet li paş xwe venegeriya û li Zana wan nenêrî. Ber bi mala komunê ya yek kesî ve meşiya. Gihîşt mala komunê. Derbasî hundirê xanî bû. Ji bo ku li seyranê û di çûn û hatina seyranê de gelek westiya bû, hema çû serşoyê xwe şûşt û hat yekser xwe li ser nivînan dirêj kir. Heya ber destê sibê têr nivist. Wexta tavê da pencera odeya ku lê nivistibû ji ber xwe ve hişyar bû. Heya ku ji malê derket û gihîşt mala Zana û Zînê her li ser rewşa Rehîm hizirî. Heval, her li ser rewşa Rehîm ê ku di dest du jinan de pir perîşan bûye, hizirî…

Heval nezewicî bû. Jixwe heval nazewicin. Hevalên ku berî tevlî refên şoreşê bibin zewicîne jî, heya şoreş pêk were xwe didan karê şoreşê… Heval hemû jî, wekî di gotina pêşiyan de hatiye gotin, bi şoreşa azadî û wekheviyê re zewicîbûn. Ango bi jiyana azad û wekhev re zewicîbûn, bi mirinê re dergîstî bûn. Heval, ji mala komunê heya mala Zana û Zînê, li ser rewşa kesên ku pir jin anîne hizîrî, li ser hûr û kûr bû. Heta ewqasî li ser vê mijarê hûr û kûr bibû ku wexta diçe mala Zana li taksiyekê yekî Azerî siwar bûye. Şofêrê taksiyê li halê heval dinêre ku gelek dihizire û bi fikar e, bi zimanê Azerî ji heval re dibêje:

-Sanirim hesablari qatiqsan (ez bawerim te hesap tevlihev kirine).

Heval jî xwe ji bîr kiriye, bi zimanê Tirkî bersivê dide şofêr:

-Yok kardeş oyle bir şey. Ben sadece şehrîn guzellîklerîne baktigim îçîn oylesîne dalmişim.

-Sen Îstanbul Turkçesî konuşursan, sen Turkiyelîsen?

-Dogrudur kardaş.

-Xoş gelmîşsen, başimla gozum ustune gelmîşsen…

-Saxol kardaş.

Heval gihîşt ber deriyê mala Zana. Dêrî nîv vekirî bû. Heval bisteh derbasî jor bû. Tenê Sîsê li mal bû. Heval, her du hinarikên rûyê Sîsê maç kir. Beriya ku heval ji Sîsê bipirsê û bêje dê û bavê te li ku ne, Sîsê got:

-Dê û bavê min çûn nava bajêr. Ji nişka ve mirovekî me nexweş ketiye. Lewma dê û bavê min çûn nexweşxanê. Jixwe tu dizani, xwişk û birayên min ji çûne dibistanê.

Sîsê, heya ku dê û bavê wê ji nexweşxanê zivirîn, li kêleka heval rûnişt û dest bi pirsan kir… Pirsên wisa ji heval dikir ku heval matmayî dibû. Pirsa wê ya yekemîn di derheqê xwezaya Kurdistanê de bû:

-Heval; cihê ku gerîlla, ango heval lê dimînin cih ên çawa ne? Asê ne? Dar û berê xwe hene? Ava xwe (pir e) zor e? Ava xwe tezî ango pir sar e?

-Belê, ew tiştên ku dibêjî hemû li Kurdistanê hene. Kurdistan wek teswîr-şanasekirina te ye. Bi kinahî Kurdistan wek bihuştê ye…

-Heval ma te bihuşt dîtiye?

Wexta ku Sisê ji heval pirsî, “Ma qey te bihuşt dîtiye?” heval matmayî bû… Nekarî bersiva Sîsê bide. Ji ber wê jî heval pir li ber xwe ket. Wexta Sîsê rewşa heval dît ku wê nikaribe bersivê bide, ji heval re got:

-Ez dizanim; xwezaya ku gerîlla tê de dimîne wek xwezaya gundê me ye. Wek xwezaya gundê me bi xêr û bêr, bi dar û ber, bi av e. Pir çem, robar, kanî tê de hene.

Pirsên Sîsê li dû hev dihatin. Yek ji pirsên Sîsê ya herî balkêş jî di derheqê Şehîd Bêrîtan de bû:

-Heval, me doh şev li fîlmê Şehîd Bêrîtan temaşe kir. Ji bo çi şehîd Bêrîtan, xwe ji wan zinarên bilind ên ku mirov newêre li xwarê binêre davêje?

-Wexta şehîd Bêrîtan xwe ji wan zinarên gelek asê û bilind avêt, partiyên Başûrê Kurdistanê PDK'ê û YNK'ê bi dewleta Tirk a dagirker re îtifaq kiribûn û li dijî me şer dikirin. Şehîd Berîtan jî ji bo ku dîl-êsîr nekeve dest wan, xwe ji zinaran davêje. Ew berxwedana şehîd Bêrîtan a li dijî paşverûtiya Kurdên ku her tim bi dijminê Kurdan re îtifaqê dikin, berxwedanek dîrokî ye.

-Dê û bavê min jî ji min re vegotibûn ku eger PDK an jî tevgera Barzanî nebûya, tevgera Qasimlo li dijî Îranê wê bi serketibûna. Dê û bavê min dibêjin; ji sedemên têkçûna tevgera Qasimlo, yek jî PDK ango îtifaqa Barzaniyan a bi Îranê re ye…

-Heval, şehîd Bêrîtan kîjan salê û li ku derê şehîd ket?

-Li Xakûrkê, sala 1992'an…

-Heval, eger ez mezin bûm, ez jî dixwazim wek şehîd Bêrîtan bibim gerîlla. Bi xelasbûna axaftina Sîsê re deriyê hewşê lê da. Sîsê, ji heval re got:

-Biborîne, divê ez li deriyê hewşê binêrim, ka kî ye li derî dide…

-Xem nake… Biçe, dibe ku dê û bavê te bin. Dibe ku hinek biyanî bin jî… Eger ku biyanî bin, ji wan re bêje, "Kes li malê nîne". Bila derbasî jor nebin.

-Baş e heval…

Sîsê çû deriyê hewşê veke. Heval jî rabû çû ber pencerê. Li paş perdê li deriyê hewşê nerî. Sîsê ji yên ku li paş deriyê hewşê ne pirsî:

-Hûn kî ne, çi kes in?" Derî vekir. Dê û bavê wê û zilamêk jî bi wan re ketin hewşê. Her sêyan jî Sîsê hembêz kirin. Rûyê wê yê sorspî maç kirin û derbasî jor bûn. Yek bi yek bixêrhatina heval kirin. Heval jî bixêrhatina wan kir. Heval berê xwe da Zana:

-Bila derbasbûyî be. Xizmê we yê nexweş çi lê hat? Şane ( în-şellah) nexweşiya xwe ne giran e?

-Ev, pismamê me ye. Tavê li serî da ye.

-Careke din derbasbûyî be. Îsal tava rojê gelekî dijwar e. Gelek mirov îsal ji ber germa tavê yan nexweş ketin, yan jiyana xwe ji dest dan. Mirovên wek min û te keçel û emrê wan êdî mezin e, pêwîst e xwe baş biparêzin…

-Gotina te ye heval. Rast e. Pêwîst e, em êdî ji xwarin, vexwa-rin, ji serma û germayê xwe biparêzin…

-Tu vê carê erzan filitî ye; dibe ku carek din bextê te wisa baş lê nede…

-Gotina te ye heval…

-Te û karxezala min we çi kir, heya em hatin?

-Heya ku hûn zivirîne, bi pirsan ez perîşan kirim. Ji her mija-rekê pirs ji min kir.

-Ez bawer dikim ku Sîsê bi pirsan tu gêj kiriye. Doh şev me hemûyan fîlmê heval Bêrîtan temaşe kir. Her ji min û bavê xwe re digot; dema ez mezin bûm, ez ê wek şehîd Bêrîtan bibim gerîlla, ez ê wek şehîd Bêrîtan bibim keçek azad… Heval, doh te sezdek çawa dît? Tu ji xizmeta me kêfxweş bû an jî tu ji xizmeta me bê-zar bû?

-Na, xwişka min Zînê! Ez, ji we qet bêzar nebûm. Bayê ku doh

dihat, ew bayê dijwar em hemû bêzar kirin. Lê, kesî ji me nedikarî wî bayê dijwar bide sekinandin. Ew tiştekî xwezayî bû. Lê belê, tiştên ku ez zêde pê aciz bûm, rewşa mala Rehîm bû. Ez bi xwe tu caran nezewîcim. Lê belê, mirov wexta kesên wek Rehîm dibîne, fêm dike ku yên du caran dizewicin, ka di çi halî de ne…

-Halê wan ne tu hal e, heval. Halê wan rezîlî ye. Di malbata Rehîm de kes kesî guhdar nake. Heya dawî ji hev dihesidin, heya dawî ji hev bê bawer in.

-Ji ber vê yekê, ez bawer im, di mala wan de her pevçûn, nerehetî û hesûdî heye…

-Ji wan jî zêdetir. Dibêjin ka wê kî ji wan zû bimre da ku mîras ji yên dîtir re bimîne…

Li ser vê gotina Zînê, heval matmayî ma û ji Zînê pirsî:

-Ango dixwazin Rehîm û Rehîma zû bimirin ku mîrate jî bi wan bimîne, ne wisa xwîşka min?

-Belê heval, heman wisa ye. Berî vê bi çend rojan, kurê herî biçûk ê Medîneyê ji jinbava xwe re gotiye:

-Înşellah tu zû bimirî! Ew sindoqa ku, tiştên giranbiha yên wek zêr, zîv û dolar tê de ne ji me re bimîne…

-Ewqas li hemberî malê dinyayê çavbirçî, ewqasî jî ji hevdu re hesûd in?

-Erê welleh! Ewqas ji hevdu re hesûd in, ewqas li hemberî malê dinyayê çavbirçîne ku jiyana wan li wan dibe jehr. Heval, ez bixwe rojekê jî nikarim tehemûla wê jiyanê bikim…

Êdî qala jiyana yên ku bi du jinan re dizewicin, di wê jiyanê de têkiliyên wan, di van têkiliyan de hesûdiya wan û li hemberî malê dinyayê çavbirçîbûna wan heval bêzar kir. Bîzê heval ji wê jiyanê vebû. Ji ber vê çendê, heval xwest bi wan re li ser mijareke dîtir biaxive û dîtinên wan bistîne:

-Beriya vê bi çend rojan, ez li mala dostekî me bûm. Zilamekî kinc-cilên wî ne utîkirî û qermiçî li kêleka min li ser kursiyê rûniştibû. Çavên zilam tim yek girtî, yek jî vekirîbû. Piştî kêliyekê zilam bi carekê got zirm û ji ser kursiyê ket xwarê. Dilê min pir bi wî zilamî şewitî… Ew zilam paşê rabû xatirê xwe ji me xwest û çû… Lê belê, ji her halê wî ve diyar dibû ku zilam gelekî li ber xwe ketiye…

-Gelo te ji dostê we pirsyar kir ka ew zilam ji kîjan miletî bû, heval?

-Belê, kekê Zana, min pirsyar kir; zilam yekî Cihû bûye…

-Cihûyên li Îsraîlê bi meşa xwe, axavtina xwe, bi her tiştekî xwe ji Cihûyên li Îranê cuda ne. Cihûyê li vî welatî wek parsekan in. Ne bi şev ne bi roj, ji jiyana xwe ne bi ewle ne. Ne xwarina wan xwarin e, ne jî vexwarina wan vexwarin e… Ez bawer dikim, ew cihûyê ku li mala dostê me te dîtî, ew ê ku li kêleka te ketiye xwarê, ji tirsa serê xwe, wê şevê xew nekiriye… bi roj xilmaş bûye, li ser kursiyê pix kiriye xewê, lewma ketiye…

Heval, wê rojê ji bo ku xatirê xwe ji wan bixwaze çûbû serdana mala Zana û Zînê. Ji ber ku wezîfeya heval li wê derê êdî bi dawî bibû. Heval berê xwe da her çar kesên ku li derdora wî rûniştibûn;

-Êdî, ez ê ji vir biçim. Wezîfeya min a li vir xelas bû. Ez hatibûm ku xatirê xwe ji we bixwazim.

-Çima te çend rojan berê ji me re negot ku tê biçî? Me hinek pêdiviyên ku li çiya ji bo te pêwîst bin, ji bo te peyda bikirina…

-Gelek spas, kekê Zana. Min hemû pêdiviyên xwe amade kirine; kincên gerîlla, şûtik, parke û hwd.

-Te pêlav jî ji bo xwe peyda kir?

-Belê.

-Wê wextê, tiştekî ku em bêjin namîne.

-Cemedaniya te heye?

-Na, min kefiye peyda nekir. Lê, li wan her du bajarên ku li ser rêka min in, ez ê yekê bikirim.

Zana, destê xwe avêt cemedaniya ser milê xwe:

-Gerîlla bê cemedanî nabe. Cemedanî hinek caran ji bo gerîlla lihêf, hinek caran doşek, hinek caran jî pêşgîr e.

Sîsê cemedanî ji dest bavê xwe girt, anî da dest heval.

Heval rahişt cemedaniya di destê Sîsê de. Bi destê Sîsê jî girt û rabû ser piyan:

-Êdî, divê ez biçim.

Hîna zû ye, şîve li cem me bixwe, piştre biçe…

-Ez çiqasî zû biçim wê ji bo min ewqas baştir be. Divê ez hinekî amadekariyan bikim…

-Tu dizanî…

Heya ber deriyê hewşê bi heval re derketin. Li ber derî, Zana û pismamê wî, yê ku ji tava rojê nexweş ketibû, bi hemû hêza xwe heval hembêz kirin. Zînê jî bi hemû heza xwe destê heval guvaşt. Heval, xwe bi ser hinarikên rûyê Sîsê re xwar kir, her du hinarikên rûyên Sîsê maç kir. Peyv ji gewriya Sîsê bi zorê derdiketin; kite kite…

-Ox…ir…a… xê…rê be, ser…kef…tin...He…val…

***

Heval ji piştî nîvro heya berbanga sibê ne tiştek xwar ne jî vexwar. Wê rojê firavîna mala Zana û Zînê, ji bo heval bû şîv jî… Heval wek carên berê heya sibehê nîv şiyar, nîv razayî bû. Wexta ku bi ser karekî de biçûna, her wisa bû; heya sibê têr xew nedikir.

Xilmaş dibû, kêliyekê di xew re diçû, kêliya din şiyar dibû. Heval ji vê taybetmendiya xwe bi şik û guman bû; gelo ev taybetmendiyek baş e, an xerab e… Tu caran dest ji xwe bernedida. Beriya ku zilamê wî heya ser sînor bibe gazî bike bi du saetan radibû. Wê şevê jî wisa kir. Ji berî ku zilamê wî bibe ser sînor bang lê bike du saetan zûtir rabibû. Taştêyek sivik kir; çend lib zeytûn, dusê parî penêr bi îskanek çayê re xwar. Dibe ku mirov ji xwarinek zû ya bi wî rengî re ne bêje taştê, bêje xwirîniya xwe şikand wê hîn çêtir be… Li bendî telefonê bû. Heya ku zilamê karmendê dewletê jê re telefon bike, di nava salonê de car caran digeriya, car caran jî li ser kursî rûnişt. Wexta ku zenga telefonê lê da, ji zilam re got, li benda min be, heya çand xulekan ez têm cihê te gotî… Rahişt du çanteyên xwe, yek ê gerîlla, yek ê sivîl û çû ser rêka asfalt. Zilamê ku wê wî bibe li kêleka rêka asfalt li benda wî bû. Bi zimanê Azerî jê re got:

-Sibeha te bi xêr…

-Sibeha te jî bi xêr…

-Te, taştê xwariye?

-Belê bira…

-Di derketina bajêr de; em ê çend sandwîç, çend ava fêkî ji xwe re bikirin…

-Baş e bira…

Di derketina bajêr de zilam taksî da sekinandin. Xwest ku ji taksiyê peya bibe. Lê heval, beriya wî bi lez ji taksiyê peya bû, çû ji supermarketê du heb ava fêkî, sandwîçek û desmalkaxizek kirî. Zivirî, hat li taksiyê siwar bû:

-Çima, te ji bo xwe jî sandwîçek nekirî?

-Di rê de bîzê min vedibe…

Heval desmalkaxiz danî pêşiya taksiyê û karmendê dewletê

taksî bi lez ajot. Şofêrê taksiyê jî bi rastî şofêr bû. Taksî di rê de qet nedihejiya. Rê ewqas xerab bû, ewqas kert û kort tê de hebûn, lê dîsan jî ne taksî dihejiya, ne jî hildipekiya. Ji bajarê ku jê derketibûn heya bajarê ser sînor; sê bajar, çar bajarok û gelek gund hebûn. Car caran di rê de her du jî qet bi hevdu re nediaxifîn, car caran pir kêm be jî bi hevdû re diaxifîn. Karmendê dewletê, karmendekî hilbijartî bû. Kêm diaxifî ku, sirên dewleta xwe eşkere neke. Heval di vê mijarê de ji wî jî xerabtir bû. Kêrê jî devê her duyan venedikir… Carekê tenê karmendê dewletê ji heval re got:

-Em, li ku derê firavînê bixwin? Heval jî jê re got:

-Ew cİhê ku em her tim lê xwarinê dixwin…

Karmend ji heval re got:

-Ew xwaringeh ya ku navê wê 2000 e, ne wisa?

-Belê.

Heval ji bilî vê, bi karmend re qet neaxifî. Her di derbarê derbaskirina sînor û li ser qaçaxçiyan hizirî. Ev hizirandin carekê tenê qut bû. Ew jî, li bajarokekî karmend gelek bêzar bibû. Xwe bi xwe bi zimanê Azerî axifî û got:

-Qanûna mirovatiyê çi ye?

-Çi bû?

-Li vî bajarokî rê nadin xelkê xerîb-biyanî. Bi taybet jî rê nadin ên wekî min! Ev saeteke ez li qornê didim, lê mirovekî tenê jî rê neda min. Wexta ku mirov ji wan dipirse jî, dibêjin, ji bo çi tu rê nadî?

Dibêjin, qanûna bajarokê me wisa ye! Ez jî ji wan re dibêjim, qanûna mirovatiyê çawa ye?

Heval jî di dilê xwe de got; ên ku gelê me xistine vî halî hûn bixwe ne…

Heval di rê de her li ser qaçaxçiyan û jiyana wan hizirî. Qaçaxçitî çi ye? Ji bo çi bi taybetî jiyana xelkê me yê li ser sînoran dijîn bi qaçaxçitiyê derbas dibe?

Li gorî fikra heval, qaçaxçitî guhdarnekirina dewletê bû. Tevî dewletê jiyankirin bû. Qaçaxçitî yek caran mêranî, yek caran jî bêbextî bû… Heval, gelek caran bi qaçaxçiyan re sînor derbas kiribû. Pir caran bi qaçaxçiyên camêr re jî, bi yên bêbext re jî rêwîtî kiribû. Carekê ji bo ku ji sînor, derbasî Rojhilatê Kurdistanê bibe, bi du qaçaxçiyan re rêwîtî kiribû. Qaçaxçiyan bêbextî li heval kiribûn. Barê her du qaçaxçiyên ku li heval bêbextî kiribûn wîskî ye. Şeş wesaîtên Landgrouser wîskî barkirî ne. Berfa demsalê ya destpêke barî ye. Berfa pûk e. Qaşo qaçaxçiyan bi buldozerê rê paqij kirine. Lê, hîna qederek berf li ser rêka şose ya ji bo wesaîtan maye. Ji ber wê, wesaît çend metreyan diçin û di nav berfê de asê dimînin. Qaçaxçî bi bêran pêşiya wan wesaîtan vedikin. Wesaîtan bi dehfdanê ji nava berfê derdixin. Heya saet nehê şevê qaçaxçî bi zorê ji berfê derdikevin reşayiyê…

Li cihekî ku bayekî sar û dijwar lê dihat disekinin. Heval di wesaîtekê bêkalorîfer de ye û kincên wî jî tenik in. Heval li gor hewaya nerm kinc li xwe kirine. Lewma ji ber serma û seqemê şeqşeqa diranên wî ne; ji sermayê dilerize…

Hinek qaçaxçî pêş de çûne ku rê keşf bikin. Karê xwe diqedînin û dizivirin. Şofêr dikevin ser dîreksiyonan û wesaîtan diajon. Digihêjin gundekî. Şofêrê ku heval pê re ye, li ber hewşa malekê wesaîta xwe dide sekinandin. Lê gundek wisa ye ku sayên wan ji sewalên wan zêdetir in. Qaçaxçî, ji heval re dibêje:

-“Bi lez peya bê û biçe vê malê…” Heval ji wesaîtê dadikeve û rasterast berê xwe dide malê. Deriyê hewşa malê vekirî ye. Heval çawa derbasî hewşê dibe, pênc sa-kûçik bi carekê êrîşî wî dikin. Heval, ji dirandina kûçikan xwe bi zorê xelas dike. Di wê kêliyê de xwediyê malê derdikeve derve. Qîr dike:

-Ew kî ye?

Heval ji tirs û heyacanê dibêje, “ez heval im!”

-Kerem ke, derbasî jor be…

-Sax bî bira…

Xwediyê malê ji heval dipirse:

-Heval, ji bo ku teslîm bibî tu hat Rojhilat?

-Na, bira! Ez berpirsyarê vê derê me.

-Çawa? Ma tu berpirsyarê PKK’ê yî yan ê dewleta me yî? Di navbera PKK’ê û dewleta me de pevçûnên dijwar diqewimin û tu jî li vir berpirsyar e? Ma qey te nagirin? Eger ku te negirin jî, bi bêbextî dikarin pir tiştên xerab bînin serê te!

-Îran, bi PJAK’ê re di nava şer û pevçûnan de ye. Ez ne nûnêrê PJAK’ê me. Ez nûnerê PKK’ê me.

-Ma qey her du jî ne yek in, heval?

-Na bira, na. Her dune yek in. PJAK, partiya Rojhilatê Kurdistanê ye.

Piştî axaftina di navbera heval û xwediyê malê de, kêliyekê bêdengiyek dikeve odeyê. Di wê kêliyê de heval li ser pirsa xwediyê malê hûr û kûr difikire. Gotina xwediyê malê ku ji heval re gotibû, tu ji PKK’ê reviya? Tu dixwazî teslîmî dewleta me bibî? Ji guhê heval dernediket. Li ser vê gotina xwediyê malê heval di dilê xwe de wê kêliyê dibêje; ev xelkê me yê Rojhilat, bi taybet yên li ser sînor niştecih in, bi piranî jî yên dewlemend bi dewleta Îranê re dixebitin…”

Xwediyê malê piştî vê bêdengiyê ji heval re gotiye:

-Em ê rabin binivin. Tu jî di odeya kurê min de, ligel wî binive. Jixwe, kurê min yekî totik vala ye. Ji tiştekî fêm nake. Lê dîsan jî, tu li gel wî behsa siyasetê neke.

Heval ji xwediyê malê re gotiye; baş e. Xwediyê malê ji heval re gotiye, şevbaş, û paşê jî ew û her sê jinên wî ji malê derketine çûne... Heval jî, xwe di nav nivînan de dirêj dike. Ji ber ku pir westiya ye, xwe dirêjkirin û nivistina heval dibe yek.

Heval nêzîkî sê saetan nivistî ye. Bi dengê kûçikan-segan ji xew şiyar dibe. Kûçik ewqas har direyên ku, mirov dibêje tiştek ne bi xêr rû daye... Heval piştî ku bi dengê kûçikan ji xew şiyar dibe, radibe ser piyan û di paş perdê re li hewşa xanî dinêre. Di hewşê de bîst an jî bîst û pênc pasdaran (leşkerên Îranê) destê xwediyê malê kelepçe kirine û bi xwe re dibin...

Di heman demê de jina xwediyê malê ya mezin hatiye odeya ku heval tê de nivistibû. Ji heval re gotiye:

-Heval, pasdar hatin zilamê me birin! Mêrik ji me re got; “heval westiyayî ye. Ji xewê şiyar nekin.” Lê mêr ê min ji ber ku ji gurçika xwe ameliyatkirî ye, em ditirsin ku di êşkencê de li xwe mikur were! Ji ber vê yekê, tu ji gund derkevî ji bo te jî, ji bo me jî çêtir e...

-Ez di ku re dikarim derkevim derveyî hewşê?

-Were heval; di vê sêlimê re derkeve ser banê xanî. Pişta xanî şiverê ye. Di wê şiverê de biçe û bi dizîka ji gund derkeve, bila kes bi te nehese. Dibe ku hîna pasdar li nav gund bin...

Heval spasiya wan dike û xatirê xwe ji jinikê dixwaze. Di sêlimê diçe ser ban. Di ser ban re xwe davêje xwarê û dikeve ser şiverê. Lê, kûçikên gund hemû çûne heval. Heval ji bo ku xwe ji kûçikan biparêze, xwe avetiye bin sîwaneka lembeya elektrîkê ya pêketî...

Wexta ku heval ji bo xwe ji kûçikan biparêze çûye bin sîwanekê, dibîne li quncikekî sîwaneyê ku şewqa lembê lê nade mêr û jina malê rûniştî ne. Bi dengekî bi tirs ji heval re gotine, “tu kî yî? Tu li vê derê li çi digerî? Pasdaran hîna niha zilamekî me girtin

birin. Eger tu kesekî qaçax bî, bi lêz ji gundê me derkeve; serê me jî û yê xwe jî nexe belayê!

Heval jî ji wan re gotiye; "van kûçikan bêdeng bikin, ez ê ji gund derkevim." Zilam û jina wî kûçik bêdeng kirine û heval wisa ji gund derketiye…

Ji gund derketiye û xwe daye serê girekî bi ewle. Ji bo ku li wir hem aliyê ku pê de biçe bibîne, hem jî karibe çolterê keşf bike. Aliyê ku wê pê de biçûna bêdeng xûya dike. Ji dûr ve jî şewqa lembeyên gund û bajarokan xuyanî dike. Rêya ku pê de biçe li gorî zêdebûna elektrîkên pêketî tespît dike. Ji ber ku texmîn dike, wê elektrîkên kêm pêketî yên gundan bin. Heval jî dixwaze biçe bajar an jî bajarokekî.

Heval, li gorî zêdebûna lembeyên pêketî çolebir dikeve ser rê û dimeşe… Li hin deveran bi hêsanî, li hin deveran bi zehmetî derbas dibe… Car caran, ji neçarî di dolek tarî û cokên avê de dimeşe. cihê ku tê re derbas dibe jî hemû kelemê diriyan e. Ji stirî û diriyan dest, rû û kincên wî çiriya ne. Di rê de gelek caran dikeve radibe, dikeve radibe… Ji ber ketin û rabûnê dest û lingên wî reş bûne… Qederekê rê meşiyaye. Çemekî mezin û şêlû derdikeve pêşiya wî. Çem bi heybet diherike. Ji ber ku çem şêlû ye, kûraniya wî nediyar e. Ji bo demeke kin dikeve nava dudiliyê; gelo xwe li çem bide û derbas bike yan neke? Dawiyê ji neçarî li çem dide. Ava çem daye heya ber qirika wî. Pir bi zehmetî çem derbas kiriye. Ber destê sibehê dengê xwendina dîkan tê guhê wî. Ber bi dengê dîkan ve dimeşe. Di rê de rastî pezê meşin hatiye. Lê, şivan pê nehisiyaye. Jixwe heval jî nexwestiye şivan bi wî bihise… Bi vî rengî ketiye nava gund. Gundekî li serê girekî, ber bi bajarok dirêjkirî …

Di hewşekê de çend mirov dîwarê xaniyekî lêdikin. Du mirov jî çayê vedixwin. Heval silavê li wan dike û dikeve wê hewşê. Ji zilamên ku çayê vedixwin pirs kiriye; "taksiyên diçin Şino, li ku disekinin?" Her du zilaman jî qet negotine, "kerem bike bira,

çayeka me vexwe." Tenê bi destê xwe rawestgeha taksiyên diçin bajêr nîşanî wî dane û ji heval re gotine "ma tu bazirgan î?

Heval, ji helwesta wan gundiyan matmayî dimîne; çawa negotibûn, 'kerem bike bira, çayeke me vexwe'. Ji ber ku, li gorî çand û adetên Kurdan kesek li wan bibe mêvan, yan jî bikeve hewşa xaniyê wan, divê wî dawetî rûnîştinê, xwarin û vexwarinê bikin…

Heval, ji cem wan zilaman heya rawestgeha wesaîtên diçin Şino peya çûye. Kêliya ku gihiştiye rawestgehê taksiyek jî di heman demê de hatiye wê derê… Heval ji şofêrê taksiyê pirsî ye; "heya Şino tê min bi çend tumenan bibî?" Zilam gotiye; "bi hezar tumenî." Heval ji şofêr re gotiye; "wê wextê, tê min derberst (xisûsî) bibe Şino?" Şofêr jî gotiye "baş e…"

Di rê de, heval ji şofêr re dibêje; "Lê min hîna taştê nexwariye. Em li Şino taştê bixwin, paşê jî ber bi r

Şofêr ji heval re gotiye; "tu biyanî-xerîb î, ez ji vê halî dibim (fêm dikim). Lê, liv û tevgera te wek ya Apoyîyan e." û şofêr di nav axaftina xwe de diyar dike ku ew sala 1992'an li Xakurkê mîlîstî kirîye û navê hevalên ku nas dike ji heval re dibêje.li ser pirsa heval bi şofêr re bo çi te dev ji mîlîstîye berda?

Şofêr dibêja hevalan ji bo hin karên taybet ez rêkir im…

Heval jî radibe serpêhatiya xwe ji serî de ji şofêr re vedibêje. Şofêr matmayî dimîne! Tenê, ji heval re gotiye; "wellehî hûn Apoyî hemû zîrek in, bêtirs in. Ez bûma, min ji sînor heya vir ji tirs û xofa ajalên dinyayê û mirovan gavek jî nedavêt…"

Şofêr ji heval re dibêje:

-Min gelek heval xwedan kirine. Em biçin mala me taştê bixwin. Piştre, ez ê bixwe te bibim Ûrmiyê. Heval jî qebûl dike. Şofêr ji rê dizivire û heval dibe mala xwe.

Jin û zarokên şofêr an xerîbdost bûn an jî ji bo ku heval bina-sîn, wek yekî ji malbata xwe pêşwazî kirine. Keçek û du kurên şo-fêr hene. Ya herî biçûk keçik e. Heya ku heval ji mala wan rabû ew her di hembêza heval de rûniştiye. Heval, bi wî rengî taştêya xwe xwariye. Wexta ku heval xatirê xwe xwestiye, keçikê ne-xwestiye ku heval ji mala wan biçe û pêsîra heval bernedaye. Da-yîk û birayên wê jî ji heval re gotine; "ji bo xatirê keça mê, tu îro li gel me bimîne… Heval ji wan re gotiye ku ev yek, ne gengaz e. Ji ber ku karên wî yên bi lez û girîng hene û careke din xatirê xwe ji wan xwestiye û ber bi Ûrmiyê ve bi rê ketine. Di rê de şofêr û he-val qet bi hev re neaxifî ne. Carekê tenê şofêr ji heval re gotiye, "em di kîjan rêkê re biçin?" Heval jî gotiye, kîjan rê bi ewle ye, em di wê rêkê re biçin baştir e…" Di rêka bi ewle de çûne û bi hêsanî gihîştine Ûrmiyê… Heval kiriye nekiriye şofêr ji heval dirav-pere wernegirtiye. Di taksiyê de çûne rûyên hev û xatirê xwe ji hevdu xwestine…

Ji Ûrmiyê heya cihê ku karmendê dewletê heval teslîmî qaçax-çiyan kiriye, ev serpêhatiya heval wekî xelekên zincîra fîlmekî di ber çavên heval re derdas bibû. Lê belê, ev serpêhatiya mîna fîlmekî sê caran qut bibû. Carekê, wexta firavîn xwarin… Carekê jî, heval ji karmendê dewletê di zimanê Farisî de wateya 'heye' û 'tune ye' pirsî bû. Wî jî gotibû; "hest" (heye), "nîst" (tune ye)… Heval jî bi henekî gotibû: "ez spasiya te dikim. Ez ewqasî li welatê we mam; lê, wexta ku êdî jê diçim ez fêrî 'heye' bûm… Carekê jî, dostekî karmendê dewletê, karmend ji cihekî heya cihekî din li taksiyê siwar kiribû, dostê wî ji karmendê dewletê pirsî bû:

-Tê bi ku de biçî?

-Ez ê vî helalî ji sînor derbas bikim.

Piştî wê jî, ji bo ku heval ji wan fêm neke bi Farisî bi hevdu re axifîbûn. Lê heval ji axaftina wan hevokek fêm kiribû. Karmendê dewletê bi dostê xwe re serpêhatiyek xwe ya derbaskirina sînor vedigot;

“Min carekê, ji bo bicihanîna pêywirekê sînor derbas dikir. Ji leşkerên me yên ser sînor yekî nobedar navê şevê (parola) ji min pirs kir. Min jî jê re got; “Xweda.” Leşker jî ji min re got, “Xweda nîst,” û gule da ber çeka xwe…

Bi wî awayî gihîştin cihê ku dê qaçaxçî, heval di sînor re derbas bike. Qaçaxçî li wê derê, li benda wan bû. Piştî silavê, karmendê dewletê bi Farisî ji qaçaxçî pirsî:

-Kemîn hest?(kemîn heye?)

-Kemîn nîst… (kemîn tune ye)

Heval û karmendê dewletê xatir ji hevdu xwestin… Qaçaxçî di pêşiyê de, heval jî bi dû wî de berê xwe dan sînor… Rêka wan bi qasî saetekê hewraz û piştre serberjêr bû. Qaçaxçî di hewraz de wek pezkûviyan bi hewa ket. Heval jî, bîst an jî bîst û pênc gavan li pey wî bi hewa ket… Qaçaxçî, piştî ku heval jî bi hewa ket, demeke kin ligel heval ma. Ji mêj de mijarek hişê heval mijûl dike… Ji qaçaxçî pirsî:

-Kaka (keko), çima dema ku mirov bi serê çiyan dikeve bêtirs û bêxof e? Wexta ku mirov li çiyan e, gelekî bi hêza xwe bawer dike…

Xwe bi xwe ji xwe re dibêje; “çiqas zilmkarên dinyayê, dagirker û mêtînger hebin bila hebin, mirov dikare li hemberî wan şer bike…”

-Wek gotina te ye kaka… Lê, baweriya te hebe wateya vê ez jî nizanim…” Bersivdayîna yê qaçaxçî, rabûna ser piyan û ji heval xatir xwestina wî di heman demê de bû. Her duyan jî xwe serberjêr berdan xwarê… Her yek bi aliyekî de… Heval ber bi warên gerîllayên azadiyê ve meşiya. Qaçaxçî jî bi aliyê din ve çû. Wê vegeriyaba derdora gundê xwe da ku car caran jin, zarok û xizmên xwe bibîne…

***